

## Hemû roj roja Kabanê ne

Em wek gaziyên ku di berxwedana Kobanê de berdêl dane parêzvanên tevahî xaka welatê xwe ne. Ti kes nikare li pêşiya me bibe kelem û me asteng bike. Bi saya şehîdan Kobanê hat rizgarkirin. Me vê serketinê diyarî Rêber Apo kir... ***Barîn Sorxwîn Kobanê/R.2***



## Çanda kurdî

Em behsa civakên ku hêj çand û zimanê wan bi xweşkî diyar nebûne yan jî ew ferqa etnîkî bi wan re pêş neketiye dikin. Li gorî dane û xebatên lêkolînî, tê zanîn ku civakên wê serdemê bi nêçîr û berhevkirinê jiyana xwe domandine... ***Rohat Bulut/R11***



## Qedexekirina zimanê kurdî

Bi dagirkirina Efrînê re jî gelek hêlan ve qedexe li hember çand û zimanê kurdî hatin bipêşxistin. Li gorî agahiyên ji herêmên hatin bidestxistin, bi destpêkirina sala xwendinê ya 2025-2026an re zimanê kurdî li dibistanên Efrînê... ***Role Mihemed/R.8***


*3 - 9 Mijdar 2025*
*Hejmar:* 307
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e





## Entegrasyona demokratîk

Entegrasyona demokratîk ne tenê yekîtiya leşkerî ye, bingeha avakirina artêşeke neteweyî ye ku li ser prensîbên demokrasî, wekhevî û rêveberiya hevbeş ava bibe. HSD, ku di şerê li dijî DAIŞê de bi roleke sereke rabû, wekî hêzeke ku ji pêkhateyên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tê, tê dîtin ku bingeha vê artêşa nû ye. Di vê çarçoveyê de, tevlîbûna HSDê tê wê wateyê ku hêzên kurd, ereb, suryan û yên din ne tenê di bin fermandariya navendî de bin, herwiha mafên xwe yên çandî, siyasî û rêveberiyê jî biparêzin. Ev pêvajo, ji adara 2025an ve mijara danûstandinan e û niha jî lîsteyeke fermandarên HSDê ji bo entegrasyonê hatiye pêşkêşkirin. Armanc, ne wendakirina desthilatdariya herêmî, entegrebûna... ***Felemez Ulug/R.6***

# Pêvînayîş avzel o

Mîyanê yew serre de Kurdîstan û Tirkîya de wareyê sîyasetî de xeylêk bedilîyayîşî qewimîyayî. 27ê sibate de bi vengdayîşê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî dest pêkerd. Na çarçewa de PKK'yî xo fesh kerd û çekê xo ronayî. Dima ra binê serbanê parlamentoyî de Komîsyonê Piştîdayîşê Neteweyî, Wayûbirayîye û Demokrasî awan bî. Tewr peyên 26ê teşrîna verêne de tayê komê gerîlayan Bakûrê Kurdîstanî ra anjîyayî. Derheqê nê averşîyayîşan de Hemsereka Pêroyî ya DBP'yî Çîgdem Kiliçgun Uçare dîyar kerd ke cinîya azade û jîneolojî paradîgmaya Birêz Ocalanî de tere kemera mîhenkî ya û wina va: "Azadîya cinîye hende meseleyo giran û dîrokî yo ke azadîya komelî ra girêdayîyê jubînî ya. Dem û devranê na dinya de her çî duştê ciniyan de xo kerdo awan. Dest, mezg, dîroka ciniyan de çi est o çi çin o mormekan hem tirto hem kî girewto binê bandora xo."



Çîgdem Kiliçgun Uçare bale ante ser muhîmîya prosesî û wina domna: "Prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî de "aktoro serekeyî" Birêz Abdullah Ocalan o. Destpêk ra heta nika raye musneno, verê sîyasetê demokratîkî keno ya. Ju armancê xo est o, awankerdisê cuya demokratîk û têduşt o. Eke komîsyon wazeno nê armancî rê hetkarîye bikero, gerek raver şêro Îmralî û Birêz Ocalanî de bêro têlewe. Gerek komîsyon tecrube û zanayîsanê ey ra feydedar bibo. Ey mîyanê 50 serran de xeylêk hukmat û îdarekarî dîyî. Modelanê çareserîyê ke welatanê bînan de ameyî caardene nêzdî ra analîz keno. Senên ke Afrîkaya Başûre de muzakerevano serekeyî Nelson Mandela bî, îta de kî Birêz Abdullah Ocalan o. Senên ke Frederîk Klerkî Afrîkaya Başûre de Mandela de pêvînayîsî kerdî û pîya peynîya rejîmê aparheîdî arde, îta de kî gerek komîsyon Birêz Ocalanî de pêdîyayîs bikero û raya çareserîye bimuso. Êdî hukmat naye qebûl bikero." ***Roportajê Lel Amedî R.4***

## Kurd ji mîtînga Kolnê re amade ne

Konfederasyona Civakên Kurdistanê ya Almanyayê (KON-MED), 8ê mijdarê, dê li bajarê Kolnê yê Almanyayê bi dirûşma "Ji Rêber Apo re Azadî, ji Kurdistanê re Çareseriya Siyasî" meş û mîtînga mezin a sêyemîn li dar bixe. Siyasetmedar Pero Dundar li ser mîtînga Kolnê got: "Êdî teqez divê şert û mercên Serok bên sererastkirin. Divê ku ew dikaribe bi her kesî re hevdîtinê bike. Armanca vê meşa me ya dawî ji bo sivikkirina destê Serok e û ku dewlet gavan bavêje. Ji ber ku dewletên Ewropayê şirîkê komployê ne, em vê meşê li vir pêk tînin. Ji bo dewletên navneteweyî û Tirkiye gavên şênber bavêjin ev meş tê lidarxistin... ***R.3***

## 'Misogeriya ti tiştî tune ye'

Desthilat her roja ku zagonên hiqûqî dernaxe û di hin rêziknameyan de guhertinan pêk nayne, pêvajoyê ji provakasyonan re vekirî dihêle. Bi hevdîtinên li pişt deriyan û hevdîtinên bi birêz Abdullah Ocalan ên sînorkirî re êdî pêvajo nayê meşandin. Karakterê çareseriya pirsgirêkên bi vî rengî li gorî merhaleyan diguhere. Heya niha meşandina bi awayê veşarî dibe ku hewce bû. Lê êdî divê zemîna rewa were avakirin. Aliyê kurdan ev zemîn rewa çêkiriye. Gelê Kurd gavên şênber davêjin. Lê desthilat hê jî pêşiya rewabûna pêvajoyê bi tevahî venekiriye. Dixwaze demê dirêj bike. Ev jî pêvajoyê dixe xetereyê... ***Zinar Ronî/R.6***

## 'Kevirê bingehîn ê aştiyê jin in'



Aştî, ne tenê nebûna şer e, di heman demê de ew hişmendiya ku rûmetê ji kesan û hevsengiyê ji civakê re vedigerîne. Bi pêkanîna aştiyê di nav civakan de dadwerî geş dibe, deriyên diyalog û aramiyê vedibin. Di civakên ku her dem dengê qeyran û şeran tê de bilind bûye, aştî dibe kevirê bingehîn ê jinûveavakirinê. Ya ku kevirê bingehîn ê aştiyê di nav civakê de datîne, felsefeya wê serwer dike pêşengtî û têkoşînê jê re dike jî jin e. Endama Însiyatîfa Azadiya Abdullah Ocalan Ayşe Efendî bal kişand ser girîngiya aştiyê û got:"Pêwîstî bi aştiyeke demokratîk ku her kes bikaribe cihê xwe di nav de bigire heye. Bi taybet di vê serdemê de, ji bo dawî li her rêbazên tundiyê were dirûşma 'Jin Jiyan Azadî' tê berzkirin. Bi vê dirûşmê dikare deriyek nû li ber avakirina civakan vebibe." Hevseroka PYDê ya Kantona Cizîrê Ayhan Mûrad ji bo avakirina civaka demokratîk wiha got: "Eger mirov bixwaze civakeke demokratîk ava bike divê xeta sereke ya vê avakirinê dabînkirina aştiyê be, bêyî aştiyê ne civak ne jî jin dikarin çav li pêşerojek azad bigerînin... ***R.2***

## Gama Çaraserîye

Vera gamanê PKK'yî dewleta tirke binê serbanê parlamentoyî de "Komîsyonê Paştîdayîşê Neteweyî, Wayûbirayîye û Demokrasî" awan kerd. Estîya komîsyonî muhîm a, la karê xo qîm nêkeno. Heta nika 16 kombîyayîşî virazîyayî, hewce nêkerdêne ke hende kombîyayîşî bibê. Ganî komîsyonî zaf lez pêşnîyazê qanûnî bikerdêne. Çiqas ke komîsyon karê xo xejilneno, hende bawerîya komelî fînena. Serekê Komîsyonî Numan Kurtulmuşî vatêne ke wa PKK gamanê şênberanê bînan bierzo, ê derbasê serûberkerdişanê qanûnîyan bibê. Netîce de Têgêrayîşê Azadî yê Kurdîstanî 26ê teşrîna verêne de gamêka tarîxî ya bîne eşte û eşkera kerd ke tayê komê gerîlayan Bakûrê Kurdîstanî ra anjîyayî. Na eşkerayîye de ma çimdarîye kenê ke reyna îradeyê çareserîye est o... ***R.9***

## Wêje û ziman

Gelo wêjevan hestên xwe çawa derbasî xwendevanên xwe dikin? Bi awayekî din bipirsim, ew çawa dikarin xwendevan û temeşevanên xwe bikin şirîkên hest û ramanên xwe? Pirseke din, zimanê berhemên wêjeyî pê tên nivîsandin û zimanê wêjeyê çi bandorê li hev dikin? Ji bo bersiva van pirsan rast were dayîn, pêwîst e mirov pêşî li dema kesên berhemên wêjeyî dixwînin, temaşe dikin an jî guhdar dikin, li rewşa wan a derûnî binêre. Ya duyemîn; têgihîn, nêrîn, çavdêrî, awayê anîna ziman a xeyalan û bihêzbûna derbirînê hesab bike. Ya sêyemîn; bikaranîna zanîna ziman di berhemên wêjeyî de ye. Heke mirov van mercan hemû li ber... ***Kamran Simo Hedilî/R.5***

## Serokwezîra yekemîn a Japonyayê

Piştî dewreyeke din a krîzên siyasî, ku bi hilbijartinên nakok û hilweşîna koalîsyona desthilatdar re hat, serokwezîra japonî ya nû, Sanae Takaichi, dest bi kar dike. Nêrînên wê yên muhafazakar bi yên her endamekî LDPê ya Japonyayê re reqabetê dikin. Ew berê wekî yekemîn jina ku posta seroka dewletê digire dîrok nivîsandiye. Ew ji nêrîna "burokratek rehet li ser kursiyek rehet" dûr e, wekî ku rêberên berê hatine wesifandin... ***Kurdistan LezgiyevaR.7***

# ‘Kevirê bingehîn ê vê aştiyê jin in’

Ayşe Efendî û Ayhan Mûrad ku du jinên têkoşer ên ji Rojava ne, gotin ku li hember binpêkirin, zext, dagirkirin, qirkirin û kuştinê, aştî pêwîstiyek e. Herwiha wan got ku kevirê bingehîn ê vê aştiyê jin in û divê jin bibin mîmarê aştiyê û cewhera civakê vejînin

Lîlav Elî

Aştî, ne tenê nebûna şer e, di heman demê de ew hişmendiya ku rûmetê ji kesan û hevsengiyê ji civakê re vedigerîne. Bi pêkanîna aştiyê di nav civakan de dadwerî geş dibe, deriyên diyalog û aramiyê vedibin.

Di civakên ku her dem dengê qeyran û şeran tê de bilind bûye, aştî dibe kevirê bingehîn ê jinûveavakirinê. Ya ku kevirê bingehîn ê aştiyê di nav civakê de datîne, felsefeya wê serwer dike pêşengtî û têkoşînê jê re dike jî jin e. Jinên ku ji ber şer û qeyranan, ji ber alozî û nearambûnê berdêlên giran dane, bûne avakarên aştiyê.

Endama Însiyatîfa Azadiya Abdullah Ocalan Ayşe Efendî û Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) a kantona Cizîrê Ayhan Mûrad ku du jinên têkoşer ên ji rojavayê Kurdistanê ne û her dem bûne pêşengên bidestxistina aştî, mafên jiyan û rûmeta gel, têkildarî aştî û girîngiya pêkanîna wê di nav civakê de, nêrînên xwe bi rojnameya Xwebûnê re par ve kirin.



**‘Jin û zarok ji şer bandor dibin’**

Dayika Şehîd Şervan û Endama Însiyatîfa Azadiya Abdullah Ocalan Ayşe Efendî di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser girîngiya aştiyê û ev tişt anî ziman: “Li hember binpêkirin, dagirkirin, mêtingerî, qirkirin û kuştina civakan, aştî pêwîstiyeke bingehîn e. Hişmediya paşverû ya baviksalar hiştiye ku civak her dem di nav qeyran û şeran de derbas be. Kesên ku herî zêde ji van şeran bi bandor bûne jî jin û zarok in. Di 50 salên dawî de, her dem jin, bi taybetî jî jinên kurd, rastî tundî, zilm û zordestiyê hatine. Lê tevî wê jî ji ber ku cewhera jinê girêdayî aştiyê ye, ew bûye avakara civakê û pêşenga serwerkirina wê aştiyê. Me got li hember binpêkirin, zext, zordarî, dagirkirin, mêtingerî, înkar, qirkirin û tunekirina civakan, aştî pêwîstiye e. Lê aştiyeke çawa? Pêwîstî bi aştiyeke demokratîk ku her kes bikaribe cihê xwe di nav vê aştiyê de bigire heye. Bi taybetî di vê serdemê de, ji bo dawî li her rêbazên tundiyê were dirûşma ‘Jin Jiyan Azadî’ tê berzkirin. Bi serxistina felsefeya ‘Jin Jiyan Azadî’ dikare deriyek nû li ber avakirina civakan vebike ku bi sedan sal in di nav şeran de difetisin.”

**‘Divê aştî pêk were’**

Ayşe Efendî li ser pêvajoya aştiyê ya 27ê sibatê û nameyên ku rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan ji jinan re şandiye wiha axivî: “Abdullah Ocalan bi pêngava 27ê sibatê re careke din vîna jinan a bilindkirina asta têkoşînê û israra wan a pêkanîna aştiya civakî zêde kir. Ji ber van hewldanên wî eger Xelata Nobelê were dayîn, divê ji bo rêber Ocalan bê dayîn. Ji ber ku yê li hember şer aştî hilbijart û li hember tunekirinê naskirina gelan hilbijart, Rêbertî bû. Em weke dayikên êşkişandî ku me parçeyek ji kezeba xwe ji bo aramî û aştiyê da, em nameyên ku rêber Ocalan dişîne silav dikin. Em weke dayik naxwazin careke din dilê dayikan bişewite. Êşa dayik û jinan yek e. Her jinek ji ber qeyran û şerên niha rû didin qurtek ji êşê vexwariye. Ji lewra ji bo ev êş careke din di dilê dayikan de kûr nebe divê aştî pêk were. Bi parastina nirx û têkoşîna jinên ku bûne lêgervanên azadiyê, dê hesreta aştiyê ku bi salan e ji civakan dûr maye, misoger bibe.”

**Bingeha civaka demokratîk**

Yek ji pêşenga Şoreşa Rojava û hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kantona Cizîrê Ayhan Mûrad jî di destpêka axaftina xwe da zanîn ku bingeha avakirina civaka demokratîk misogerkirina aştiyê ye û wiha got: “Eger mirov bixwaze civakeke demokratîk ava bike divê xeta sereke ya vê avakirinê dabînkirina aştiyê be, bêyî aştiyê ne civak ne jî jin dikarin çav li pêşerojek azad bigerînin. Bi taybetî dema ku em vedigerin dîrokê û li destpêka mirovahiyê dikolin em dibînin ku ya civak ji helandinê rizgar kiriye, dadwerî, lihevkirin, çareserî, azadî û aramî di nav malbatê de belav kiriye jin e. Bi qasî ku mêrê serdest hişmediya xwe ya serdestiyê, kolekirin, xerakirin û diziyê belav kiriye bi qasî wê jin têkoşîna jiyaneke bi ewle kiriye. Her dem ji bo jinûveavakirinê jin bi jiyanê re ketiye nav pêşbirkê, ji ber vê yekê kevirê bingehîn yê aştiyê jin e. Eger daxwaz û nêrînên jinan esas neyên girtin dê krîzên di civakan de kûrtir bibin û wêranî her serdest be.”

**‘Jin cewhera civakê vedijînin’**

Ayhan Mûrad di berdewamiya nirxandinên xwe de anî ziman ku, divê jin bibin mîmarê aştiyê û cewhera civakê ya ku jê hatiye dizîn careke din vejînin. Wê wiha direjî da axaftina xwe: “Bi hatina Tevgera Azadiyê re êdî rê li ber jinan vebû ku careke din li dîroka xwe vegerin û wê vejînin. Îro tevî hemû planên qirkirin û tunekirinê jî jin bûne mamosteyên zanîn, siyaset, birêvebirin û biryardayînê. Îro jin bi heman daxwazê têkoşîna sîstemêm kapîtalîst û yên desthilatdar ku bûne sedema hilweşandina civakan û mezinkirina şeran dike. Bi sedan jinên pêşeng bi armanca bidestxistina aştiyê canê xwe feda kirin û heta roja îro wî ruhê mezin dikin. Ji ber ku aştî pêwîstiyeke jiyanê ye, bêyî wê azadî nayê bidestxistin. Divê em bibin mîmarê aştiyê û cewhera civakê ya ku jê hatiye dizîn careke din vejînin.”

**Mezinkirina têkoşînê**

Ayhan Mûrad di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser têkoşîna jinan a li rojavayê Kurdistanê û got: “Em wek jinên rojavayê Kurdistanê me ji ber rêjîmên serdest gelek êş û jan kişandin. Lê îro bi saya têkoşîn û berxwedanê em sîstemeke demokratîk, azad a li ser bingeha aştiya civakî bi rê ve dibin. Ji bo êdî şer bi dawî bibin, zarok bi kêfxweşî bijiyan û jin nebin qurbanên siyasetên desthilatdaran, divê em nimûneya li rojavayê Kurdistanê bikin mala tevahî cîhanê û di şexsê jinan de azadî, demokrasî, wekhevî û edaletê pêk bînin. Tecrûbeya ku îro jinên Rojava bi dest xistiye, dikare bibe stûnek ji bo mezinkirina têkoşîna ji bo aştiyê.”

Barîn Sorxwîn Kobanê

# Wê hemû rojên me Roja Kobanê ya Cîhanî bin

Çeteyên DAIŞê yên xwedî zîhniyeteke tarî û dijminê mirovatiyê, 16ê îlona 2014an, bi piştevaniya gelek hêzên dagirker dest bi êrîşên xwe yên li hember bajarê kevnar ê kurdan kir. Wan êrişkaran hebûna gelê kurd hedef girt. Wan hewl da ku gelê kurd li rojavayê Kurdistanê têk bibin û li ser erdnîgariya Sûriyeyê tesfiye bikin.

Wan çetayan û mutefikên wan her tişt plan kiribû, lê haya wan jê tunebû ku xelkê Kobanê dilsozê Rêbertî û Tevgera Azadiyê ye. Parastina xakê ji bo kobaniyan mijareke rûmetê ye û di vê de qet gavan paşde navêjin. Bi vê hişmendiyê xelkê Kobanê got: ‘’Kobanê yê me ye û em ê dest jê bernedin. Bila çete û hevkarên wan werin û xwe biceribînin.’’ Bi vê helwest û fikrê xelkê Kobanê û şervanên azadiyê dest bi berxwedanê kir. Ciwan û jinên birûmet ên li her çar parçeyên Kurdistanê, gerîlayên Apoyî, dostên gelê kurd û kesên ji vê berxwedana birûmet a li hember dijminên mirovatiyê bandor bûn, berê xwe dan warê şeref û kerametê Kobanê. Di vê berxwedanê de gelek şêrejin û mêrxasên çiyayî heta dawiyê şer kirin û çûn şehadetê. Bi sedan lehengên hêja jî birîndar bûn û bûn gaziyên şer.

Bajarê Kobanê bû bajarê berxwedanê û biryara ‘yan serkeftin yan serkeftin’ hat dayîn. Tevî ku serokkomarê Tirkiyeyê Tayyîp Erdogan got, “Ha ket ha wê bikeve”, şervanên rêber Apo hemû hewldanên wan pûç kirin, bajarê xwe yê rûmetê bi canê xwe parastin û bi serbilindî çûn şehadetê. Îro jî em di encama vê berxwedanê de qala Roja Kobanê ya Cîhanî dikin. Wan egîdan êrişên hov pûç kirin. Piştrast kirin ku gelê kurd xwedî hêz e û dikare xwe biparêze. Keç û xortên welatê min xwe bi rext û çekan pêçan, berê xwe dan meydanên cengê û hemû hesabên neyar û xayinan têk birin.

Şer li bajar û gundewarên wê belav bû û Kobanê bû meydana berxwedana hesabpirsîneke dîrokî. Ciwanên kurd û enternasyonal qefle bi qefle berê xwe dan şerê xîretê û bi wijdanî şer kirin. Keçên çeleng û xortên delal, bi dil û can destanên lehengiyê nivîsandin. Bi roj û mehan li ber xwe dan heta bajar û gundewarên Kobanê ji çeteyên tundrew paqij kirin û warê xwe rizgar kirin. Ciwanên fedayî canê xwe ji bo bajarê xwe kirin çeper û mertal da ku çeteyên dijminên mirovatiyê di bajarê me de nemînin û gelê me nekeve destê wan tundrewan. Ji Bakur, Başûr û Rojhilat welatparêzan berê xwe da Rojava, li bajarê Kobanê û ketin şerê parastinê.

Rêber Apo bang li tevahî ciwanên kurd kir û got: “Divê hûn seferber bibin, welatê xwe biparêzin.” Ciwanan jî li ser vî esasî berê xwe da Kobanêya warê rûmetê. Xelkê me yê Bakur sînor rakir û kesî nikarî wan rawestîne. Dengê berxwedana Apoyiyan cîhan hejand. Berxwedaniya keç û xortên me bû weke lehiyê û neyar li ber xwe bir. Ew berxwedan jî bi fikir û ramanên rêber Apo xurt bû û gel hat rêxistinkirin. Şer û cenga şehîdên qehreman berhem da û çeteyên DAIŞê, li Kobanê hatin tunekirin.

Me gelek şehîdên qehreman û giranbuha di vê berxwedana rûmetê de wenda kirin. Şêrejin û mêrxasên weke Cûdî, Gelhat, Arîn, Rêvan û bi sedan şehîdên birûmet û fedayî canê xwe di oxira azadiyê de feda kir. Em careke din wan egîdan bi bîr tînin û bejna xwe bi hurmet û minetdarî li hemberî wan ditewînin.

Di encama vê berxwedana biheybet de bi banga dilsozên gelê kurd û dildarên mirovatiyê her sal 1ê mijdarê weke Roja Kobanê ya Cîhanî tê pîrozkirin. Em Roja Kobanê ya Cîhanî destpêkê li Rêbertiya xwe, tevahî gel û jinên azadîxwaz pîroz dikin. Em dibêjin wê Kobanê her tim weke keleha berxwedanê bimîne. Em weke gaziyên şer ên di vê berxwedanê de berdêl dane jî, parêzvanên tevahî xaka welatê xwe ne. Ti kes nikare li pêşiya me bibe kelem û me asteng bike. Bi saya şehîdên birûmet Kobanê hat rizgarkirin û me ew serkeftin diyarî rêber Apo kir. Rêber Apo zêdetirî 19 salan li Rojava û Rojhilata Navîn ma û têkoşiya. Şoreşa Rojava her wiha şoreşa jinan û berhema keda rêber Apo ye.



# Ji bo Kurdistanê 2 milyon berû

## Komeleya Ekolojiyê ya Wanê û Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê, dê li 5 bajarên Serhedê 700 hezar û li tavahiya Kurdistanê jî 2 milyon darên berûyan biçînin

| Yilmaz Yilmaz

Ekolojîst, bi pêşengiya Komeleya Ekolojiyê ya Wanê (WAN Eko-Der) û Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê û bi hevkariya Şaredariya Westanê bi dirûşma "Tu jî berûyekê kom bike, tu jî berûyekê biçîne" dê li Serhedê 700 hezar dar biçînin. Endamên komeleyê yên li taxa Kazaq a navçeya Westanê bi peyama "Tiştên te ji xwezayê wergirtine bide xwezayê" tovên berûyan dan hev. Dê van berûyan li Wan, Mûş, Colemêrg, Bedlîs û Agiriyê 700 hezar û li tavahiya Kurdistanê jî 2 milyon şitilên darên berûyan biçînin.



**Bi salan xweza talan kirin**

Hevberdevkê Komeleya Eko-Dera Wanê Erdogan Oduk anî ziman ku ji salên 1990î heta bangra rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan a 27ê sibatê, xwezaya Kurdistanê di gelek qirkirinan re derbas bû û wiha got: "Bi salan xwezaya Kurdistanê hat qirkirin û talankirin. Di vê qirkirinê de hem heywanên li Kurdistanê, hem daristan û hem jî însanên li vir zirarek gelek mezin dît. Li dijî vê qirkirin û talanê me û Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê jî biryar da. Me got li dijî vê qirkirinê divê em xwezaya Kurdistanê ji nû ve zindî bikin. Li şûna daristanên hatine qirkirin, em ê daristanên nû ava bikin. Me biryar da ku li her derê Kurdistanê daran deynin."

Erdogan Oduk da zanîn ku wekî Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê mehek berê biryara çandiniya daran da û wiha got: "Me 10 roj berê li navçeya Westanê ya Wanê dest bi çandiniya daran kir. Em ê li tevahiya Wanê darên berûyan biçînin. Em ê dîsa meha mijdarê li Botanê jî darên berûyan biçînin."

**Berû kurdistanî ye**

Erdogan Oduk, li ser sedema çandina darên berûyê jî got: "Çima darên berûyê? Lewra berû dareke kurdistanî ye. Hem kokên wê axê baş digirin, hem jî ava bin axê paqij dikin. Kokê wê zexm in û emrê wê pir dirêj e. Li dijî talanê zexm e. Em ê payizê li Serhed û Botanê biçînin. Em ê meha nîsanê jî dîsa biçînin. Armanca me li tevahiya Kurdistanê 2 milyon dar in."

**Li bajaran xwe bi rêxistin bikin**

Erdogan Oduk li ser xebatên rêxistinkirinê jî ev tişt gotin: "Ji bo parastina xwezayê, xebata Tevgera Ekolojiyê ya Mezopotamyayê ya yekemîn, rêxistinkirina saziyên ekolojiyê ye. Armanc ew e ku li her bajarekî saziyek û platformek ekolojiyê bê avakirin. Tevgera Ekolojiyê li ser ekolojiya civakî dixebite. Dîsa li ser ava Kurdistanê xebat tên kirin. Em dizanin ku Kurdistanê tev kirine kanên madenan. Bi taybetî li Cûdî û Gabarê kanên madenan vekirine. Herwiha li geliyê Zîlanê kanên madenê vekirine. Li ser tevahiya axa Kurdistanê qirkirineke mezin heye. Armanca me ew e ku em sermayedar û şîrketên dewletê ji axa dûr bixin."

Hevberdevk Erdogan Oduk bi lêv kir ku dema komele û platform hatin avakirin, dê di serî de li dijî şîrket û sermayedarên ku li Kurdistanê xwezayê talan dikin, bixebitin û wiha axivî: "Ji niha û şûn de li ku dera Kurdistanê xweza bê talankirin em ê li wir bin. Em çûn Bestayê jî û em çûn Agiriyê jî, me li dijî talankirinê xebat kir. Ev xebat têr nakin. Kêmasî gelek in. Divê gelek xebat bên kirin. Xweza ne tenê warê mirovan, warê sewal û hemû zindiyan e. Bi hezaran cureyên sewal û gihayan hene. Ev xweza ya tevan e. Dema em ji gundên xwe koçber bûn, ew sewal û giha li wir man. Di şer de hemû şewitandin û kuştin."

Erdogan Oduk herî dawî da zanîn ku ew li hemû saziyan digerin û wiha got: "Em li ser qirkirina xwezayê raporê amade dikin. Di şerê 40-50 salan de xwezaya Kurdistanê gelek talan bûye. Em dixwazin di serî de vê talankirin û qirkirina pêk hatî tespît bikin û xwezaya xwe biparêzin."

---

# Kurd ji mîtînga Kolnê re amade ne

| Mehmet Alî Ertaş

Konfederasyona Civakên Kurdistanê ya Elmanyayê (KON-MED), 8ê mijdarê, dê li bajarê Kolnê yê Elmanyayê bi dirûşma "Ji Rêber Apo re Azadî, ji Kurdistanê re Çareseriya Siyasî" meş û mîtînga mezin a sêyemîn li dar bixe. Nûner û rêveberên KON-MEDê, ji bo meşa Kolnê ya 8ê mijdarê xebatên xwe di asta herî jor de berdewam dike: belavokan belav dikin, civînan pêk tînin, li dehan bajaran otobus organîze kirin û banga tevlîbûna meşê dikin. Dîsa KCDK-E, rêxistinên jin û ciwanan jî bênavber xebata meş û mîtîngê dikin.

Li ser armanc, xebat û amadekariyên meş û mîtînga Kolnê siyasetmedar Pero Dundar agahî dan û got: "Ev meşa 3yemîn e ku em li bajarê Kolnê pêk tînin. Di serî de dostên kurdan ku ji gelek rewşenbîr û siyasetmedaran pêk dihat, ji bo azadiya rêberê gelê kurd û çareseriya pirsgirêka kurd a siyasî kampanya dabûn destpêkirin. Ev meş û mîtîng di çarçoveya vê kampanyayê de pêk tên. Ev pêngava ku 10ê cotmeha 2023yan dest pê kir, li hemû cîhanê belav bû. Ji bo azadiya fizîkî ya rêber Apo gelek calakiyên curbicur pêk hatin. Meş, panel, konferans û civîn tên lidarxistin. Mijara van hemû çalakiyan azadiya fizîkî ya Serokatiyê ye. Azadkirina dîrok, çand, ziman û nasnameya me ye. Di şexsê Serok de îro dîrok li giravê hatiye tecrîdkirin. 27 sal in di şexsê Serok de gelê kurd tê tecrîdkirin.

Siyasetmedar Pero Dundar, anî ziman ku dema rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan dîl hat girtin got 'Ez ê ji bo jîn û jiyandinê bijîm' û wiha berdewam kir: "Îro ji ber tecrîdê li her derê cîhanê jiyana mirovan di bin xeteriyê de ye. Îro li her derê êrişên cuda hene. Navbera gel û hêzên dewletan her ku diçe vedibe. Îro şerê li Sûriye û Rojhilata Navîn projeya hêzên navdewletî ye. Êrişên ku îro pêk tên, li ser navê DAIŞê pêk tên, nav û cilên wan hatine guhertin. Hêzên navdewletî bi van êrişan dixwazin dîsa pergala xwe li Rojhilata Navîn ava bikin. Îro em dibînin ku her diçe dewlet û civak ji hev dûr dikevin. Ji ber daxwazên wan cuda ne. Li aliyê din ji ber ku Serok alternatîfê bi pêş dixe, tecrîd di salên dawî de li ser wî kûr kirin. Ji ber tecrîda kûr 3 sal berê ji aliyê heval û hogirên kurdan ve û kampanya hat destpêkirin û îro ev didome. Ji bo Serok diyar dike ku azadiya wî ne şexsî ye azadiya wî girîng e. Armanca Serok ew e ku gelên cîhanê xwe azad bibînin."


**Koln bûye sembola çalakiyên azadiyê**

Pero Dundar anî ziman ku ger şer dubare bike, êdî civak têk diçe û wiha lê zêde kir: "Dema meşa ewil dest pê kir, xwesteka ewil rakirina tecrîdê bû. Bi sed hezaran mirov beşdarî vê meşê bûn. Ji ber ku Koln navenda kurdan e û gelek kurd li vir dijîn, Koln bûye sembola meşa azadiyê ya gelê kurd. Armanca meşa ewil û meşa duyemîn a li Kolnê yek bû. Armanca herduyan jî azadiya Serok û çareseriya pirsgirêka kurd bû. Îro ku dewlet bixwaze dikare wekî girtiyekî siyasî bi awayekî asayî bi malbat û parêzeran re hevdîtinan bike, lê Serok azadiya xwe wekî azadiya civakê dibîne û daxwazên wî ne şexsî ne. Hin hevdîtin pêk hatin, lê diviya bû ku ev gav zûtir hatibûna avêtin. Êdî teqez divê şert û mercên Serok li gorî muzakereyan û pêdiviyên pêvajoyê bên sererastkirin. Ji bo pêvajo bi pêş bikeve divê şertên wî teqez bên sererastkirin. Divê ku ew dikaribe bi her kesî re hevdîtinê bike. Ev hemû Rojhilata Navîn eleqeder dikin. Armanca vê meşê me ya dawî ji bo sivikkirina destê Serok e û ku dewlet gavan bavêje. Ji ber ku dewletên Ewropayê şirîkê komployê ne, em vê meşê li vir pêk tînin. Ji bo dewletên navneteweyî û Tirkiye gavên şênber bavêjin ev meş tê lidarxistin."

Pero Dundar li ser xebatên ku bi rojan in tên kirin jî rawestiya û ev agahî dan: "Di van xebatên ku ji civînên gel, serdana esnafan, karên dîplomasiyê û belavokan pêk tê, em li aliyekî li ser armanca meşê radiwestin, li aliyê din, em li ser pêvajoyê bi civakê re nîqaş dikin. Em hem li rexneyên wan guhdarî dikin û hem jî pêşniyarên wan werdigirin. Armanca vê meşê ew e ku em pêvajoyê bi civakê re nîqaş bikin. Bi hezaran belavok tên belavkirin. Di van xebatan de em civînan pêk tînin, belavokan belav dikin û bang li heval û hogirên kurdan dikin. Dîsa ji bo dewlet gavan bavêjin karê dîplomasiyê tê kirin. Li gelek navendan komîsyon hatine avakirin. Jin û ciwan pêşengiya vê meşê dikin. Em nerînên Serok li hemû kolanan bi gel re nîqaş dikin.

Pero Dundar da zanîn ku di xebatan de tê dîtin ku civak bi dewletê ne bawer e û wiha pêde çû: "Dewletê heta niha bawerî nedaye civakê. Gel diyar dike ku lîstikên dewleta tirk xelas nabin. Ji ber ku her tim bi qirkirin û lîstikan nêzîk bûye. Gel dixwazin Serok, girtiyên siyasî bên berdan û ji bo komên çek şewitandine dikaribin tev li siyasetê bibin şert bên avakirin. Em dixwazin meşeke bi rêxistinî û girseyî pêk bê."

Siyasetmedar Pero Dundar herî dawî li ser plan û amadekariyên ji bo meşê jî rawestiya û got: "Em her roj kom dibin û xebatên xwe di ber çavan re derbas dikin. Li hemû bajarên derve bi sedan otobus hatine krêkirin. Meş saet 11ê serê sibê dest pê dike. Hemû xebatên teknîkî xelas bûne. Gel armanc dike ku vê meşê bi Serokatiyê re bike. Meşa mijdarê ji bo gelê kurd li dijî qirkirin û tunekirinê meha berxwedanê ye. Em li mal û esnafan digerin. Em ê vê carê meşek xurttir pêk bînin.''



Pero Dundar da zanîn ku dê Hevserokê DBPê Keskîn Bayindir û dê gelek dostên kurdan tev li vê meşê bibin û got; ''Li ser navê rêxistinên cuda dê peyam bên dayîn. Em ê bi meşê dest pê bikin û bi mîtîngê bi dawî bikin. Dibe ku meş û mîtîng bi dawî bibe, lê dê têkoşîna me li her qadê bidome.''

Pero Dundar herî dawî bang li tevahiya gelê kurd kir û xwest beşdarî meş û mîtîngê bibin. Pero Dundar xwest ku ji bo xelaskirina şer, aştiya civakî û azadiya fizîkî ya rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan hemû kesên xwe xelatparêz dibînin beşdarî mîtîngê bibin. Wê got kur ew bi taybetî bang li jin û ciwanan dikin ku tev li xebatên mîtîngê bibin.

---


## Li Tirkiyeyê 4 hezar û 561 zarok girtî ne

| Zafer Veşîn

Li gorî rapora Komeleya Civaka Sivîl a Sîstema Cezayên Înfazê (CÎSST) li girtîgehên Tirkiye û Bakurê Kurdistanê zêdeyî 420 hezar mirov girtî ne.

Li gorî rapora CÎSSTê li 402 girtîgehên Tirkiye û Bakurê Kurdistanê bi giştî 420 hezar û 904 mirov girtî ne. Tevî ku kapasîteya van girtîgehan 304 hezar û 964 mirov in jî, li gorî kapasîteyê, 116 hezar û 18 girtî zêdeyî kapasîteyê di girtîgehê de girtî ne.

Li gorî rapora CÎSSTê rêjeya tijebûnê li girtîgehan sedî 138 e. Li gorî raporê 357 hezar û 646 girtî cezayê wan hatiye êrêkirin. 63 hezar û 258 mirov jî li gel darizandina wan didome, bêyî ku ceza xwaribin, bêceza tên girtin.



**Kal, pîr, jin û zarok girtî ne**

Li gorî daneyan 4 hezar û 561 zarok ên temenê wan di navbera 12-18 salî de girtî ne. Dîsa li gorî raporê ji kesên hatine girtin, 19 hezar û 290 jin in. 434 zarok di navbera 1-3 salî û 388 zarok jî 4-6 salî ne. Ji girtiyan 6 hezar û 543 kes jî temenê wan zêdetirî 65 salî ne.

Di rapora CÎSSTê de tê destnîşankirin ku girtîgehên Tirkiyeyê ji kapasîteya xwe ya heyî gelekî zêdetir dixebitin û ev tijebûna zêde şert û mercên jiyana girtiyan dijwar dike û ji bo binpêkirina mafan zemînê amade dike.

**Palana 11 girtîgehên nû**

Di çarçoveya projeyên Wezareta Dadê yên sala 2025an de ji bilî ku 11 girtîgehên nû bên lêkirin dê kapasiteya girtîgehên heyî jî were zêdekirin. Li gorî projeya Wezareta Dadê ya Tirkiyeyê, di serê sala 2025an de hat plankirin ku 11 girtîgehên nû bên avakirin. Tê pêşbînîkirin ku ji bo temamkirina projeyan heta dawiya sala 2027an bi giştî 23 milyar û 585 milyon lîre bên xerckirin.

Platforma Ked û Demokrasiyê ya Wanê, têkildarî muameleya xerab, îşkence û binpêkirina mafan ên li girtîgehan li Kolana Hunerê ya navçeya Rêya Armûşê daxuyanî da. Endamên platformê di daxuyaniyê de pankarta "Tecrît sûcê mirovahiyê ye, divê girtîgehên mîna bîrê (kuyu tipi) bên girtin" vekirin. Nûnerên saziyên sivîl, endam û rêveberên partiyên siyasî û gelek kes tev li daxuyaniyê bûn.

**51 girtîgehên Y û S ava kirin**

Hevserokê Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Wanê Mehmet Salîh Coşkûn jî diyar kir ku li Tirkiyeyê girtîgeh, ji sala 2021an vir ve, bi tevahî 51 girtîgehên cûreyên nû bi navên "Saziya Cezayê ya Tîpa S", "Saziya Cezayê ya Tîpa Y" û "Saziya Cezayê ya Ewlekariya Bilind" hatine vekirin. Li gorî daneyên dawî, 22 girtîgehên cûreya Y, 22 girtîgehên ewlehiya bilind û 7 girtîgehên cûreya S hatine vekirin.

## ARMANCÊ MA AZADÎYA CINÎYAN A

# Kîlitê çareserîye Îmrali der o

■ Lêl AMED

*Mîyanê yew serre de Kurdîstan û Tirkîya de wareyê sîyasetî de xeylêk bedilîyayîşî qewimîyayî. 27ê sibate de bi vengdayîşê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî dest pêkerd. Na çarçewa de PKK'yî xo fesh kerd û çekê xo ronayî. Dima ra binê serbanê parlamentoyî de Komîsyonê Piştîdayîşê Neteweyî, Wayûbirayîye û Demokrasî awan bî. Tewr peyên 26ê teşrîna verêne de tayê komê gerîlayan Bakûrê Kurdîstanî ra anjîyayî. Derheqê nê averşîyayîşan de no hewte ma Hemsereka Pêroyî ya DBP'yî Çîgdem Kiliçgun Uçare reyde qisey kerd.*



Hemsereka Pêroyî ya DBP'yî Çîgdem Kiliçgun Uçare ard ziwan ke wa Komîsyonê Piştîdayîşê Neteweyî, Wayûbirayîye û Demokrasî şêro Îmrali û nîya qisey kerd: "Kîlitê çareserîye destê Birêz Ocalanî de yo. Gerek komîsyon tecrube û zanayîsanê ey ra feydedar bibo. Çike o atmosfer û awanîya sîyasetî zaf rind zano."

***Mefhûmê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî "cinîya azade" û "jîneolojî" semedê têkoşînê cinîyan çi îfade kenê? No nêzdîbîyayîs polîtîkaya pratîkî de wayîrê kamcî mana yo?***

Cinîya azade û jîneolojî paradîgmaya Birêz Ocalanî de tere kemera mîhenkî ya. Azadîya cinîye hende meseleyo giran û dîrokî yo ke, azadîya komelî ra girêdayîyê jubînî ya. Dem û devranê na dinya de her çî duştê ciniyan de xo kerdo awan. Dest, mezg, dîroka ciniyan de çi est o çi çin o mormekan hem tirto hem kî girewto binê bandora xo. A waxt ra hata nika, cinîyî kerdê kole; emege, zanayîs û estbîyayîsê înan dardê we. Koletîya cinîyan peydana pêro komelî ra bîyo vila, serdestîya mormekî û pergalê netewe-dewlete nîya payan de mendo. Coka Birêz Ocalan vano ke çiqas cinîyî benê azad, hende komel kî beno azad. Veng û xoverdayîsê cinîye çiqas beno berz, hende kî têduştîya cinîye yena hurêndî.

Na serdestîya camêrdî her ca de nameyê cinîye hende kerdo xirabin û xerîb ke, ti hîn zana/î ke serê na dinya de qet cinîye cuya xo nêramito. Îşte jîneolojî kî duştê na zure de estbîyayîsê cinîye, zanayîs û emega cinîye ano zon. Tarîye de çutir fenere cenîme destê xo ke vernîya xo kenîme roştî, jîneolojî kî pêrodayîsê cinîye de tere fenere dîroka xo keno roştî.

Jîneolojî bi cinîya azade zerreyê sîyasetê demokratîkî de destê ma keno çîp, pêrodayîsê ma keno xirt. Çeverê sîyasetî cinîye ra kerd ra, hem pergalê hemserekîye hem pergalê fermuarî hem kî temsîlîyetê têduştî sîyaseto ke bê cinîye yeno viraştene, mahkûm kerd.

Sîyasetê camêrdî persa komelî ra nêbeno derman, têyna xo ra cayê îqtîdarî virazeno û serê îqtîdarî de cinîye, doman, karker, xoza her çî bênan, bêawe, bêfikr û neçar verdano ra. Eke cinîye zerreyê sîyasetî de bîye, sîyaset beno demokratîk, beno çeverê çareserîye.

***Seke zanîyeno Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan azadîya cinîyan sey verşertê azadîya komelkî hesibneno. Goreyê sima no hesibnayîs polîtîkayanê cinîye yê DBP'yî senên form keno?***

Felsefeya cinîye, cuye, azadî ma rê rayber a. Raver koletîya cinîye wazenîme ke wedarîme. Zanîme ke koletîye sifte serê cinîye de bîye awan. Uca ra kî bîyo pergal, tere pêçege zerreyê komelî ra piroşîyo ra. No pergal raştîya komelî nîya, raştîya na dinya nîya. Meclîsê Cinîyan ê Partîya ma pergalê hemserekîye û temsîlîyetê têduştî hem zerreyê partîye de hem zerreyê komîsyonanê xo de ramino. Raver cinîye de, dîroka cinîye, kamîya cinîye ebe perwerde ebe kargeh qisey kenîme, pergalê serdestîya camêrdî danîme naskerdene. Demê verênî de çutir têduştîye bîya, çutir têkilîya cinîye bi camêrdî bîya, kamî zanayîsê ma destê ma ra girewto berdo înan qisey kenîme. Têyna cinîye de nê, camêrdê ke zerreyê partî der ê, înan de kî qisey kenîme. Têyna xo bi xo nêgurînîme. No pêrodayîsê cinîye şimikê azadîya komelî yo. Kam ke azadîya cinîye nas keno, bizano ke hende nêzdîyê azadîya xo yo. Her kar de, her gure de têlewebîyayîsê cinîye û camêrdî, şaşîtîya dîroke û şaşîtîya camêrdan keno eşkera.

Cinîyî zerreyê komelî de lete ra zêde yî. Hende ke cinîye azadîya xo ra dûr a, kamcî camêrd vajo ke mi azadîya xo girewta destê xo, zur a. Coka ma raver azadîya cinîye ser gurînîme, aye ra dime camêrdan kaş kenîme anîme. Nêvanîme ke camêrd tever de bimano. Eke camêrdî nêvurîyayî, eke pergalê serdestîya camêrdî nêvurîya, kes nêreseno azadîye.

***Sima prosesê çareserî yo newî yo ke demê peyênî de dest pêkerd ser o çi fikrîyenê? Mabênê nê prosesî û prosesanê bînan de cîyayîye est a?***

Demo newe fîrsendo girs o û muhîm o. Zerreyê se serran de şaro kurd nêtersa, kamîya xo, îtîqatê xo û zonê xo sevekna, ard heta nika. Çi wazeno şaro kurd? Kamîya xo û estbîyayîsê xo bêrê naskerdene. Şer nêbo û kes nêmiro. Netewe-dewlete hem ma kerdî xerîb, hem zî înkar kerdî. Hama demo henên ame ke, estbîyayîsê kurdan kes nêşîkîno înkar bikero. Şaro kurd seba demokrasî, seba cuya hempare û seba têduştîye bî hêz û temînat.

Eşkera bî ke, duştê pergalê kapîtalîzmî de alternatîf est o. Mîsal Rojawan. 27ê gucige de vengdayîsê birêz Ocalanî ebe perspektîfê xo, çareserîya persa kurdan ra raya newe kerde ra. O pîlkerdisê sîyasetê demokratîkî pêşnîyaz keno. Yanî wazeno ke êdî wirdî tereflî bêrê têhet, bi dîyalog û qiseykerdis persanê xo çareser bikerê. Tewr zîyade dewlete rê metodê "demokrasîyê muzakerevanî" bîla pêşnîyaz kerd. No proses prosesanê bînan ra cîya yo. Nika hem halê zerreyî hem kî halê teberî vurîya. Konjonkturo sîyasî dewleta tirke ferz keno ke wa gamanê demokratîkbîyayîsî bierzo. Îdarekarê dewlete kî zanê polîtîkaya netewe-dewlete ya seserra XX. ginaye piro. Coka ê kî mecburî tewrê nê prosesî bibê. Bêguman hişê înan de dewamkerdisê estîya netewe-dewlete est o, hama wazenê bi tayê reforman hêzdar bikerê. Îqtîdar kamcî hesaban keno wa bikero, armancê ma hemwelatîya têduşt a. Seba ke ma biresîme nê armancê xo, ma yo xoverdayîsê xo dewam bikerîme û sîyasetê demokratîkî pîl bikerîme.

***Sima kî tewrê merasîmê çekan bîyî, vengdayîsê Abdullah Ocalanî yê "êdî çekî hiş bibê, sîyaset qisey bikero" senên ercnenê? No vengdayîs hetê pratîkî ra çi wazeno?***

Birêz Ocalan bi enerjî, zanayîs û fikrîyatê xo prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî rê hetkarîyêka pîle keno. Têyna nika nê, hertim girîngîye dano dîyalog û qiseykerdisî. Mîsal serra 1997 de bi rojnameger Fatîh Altayli roportaj kerd, dîyalog û çareserîya demokratîke pêşnîyaz kerd. Seba sîyasetê demokratîkî nêzdîbîyayîsê xo qet nêvurîya. Ewro kî vano wa pêro persî bi destê sîyasetê demokratîkî bêrê çareserkerdene. Coka mabênê hukmat, Îmrali û heyetê DEM Partî de têdîyayîsî est ê. Coka bi waştisê ey binê serbanê parlamentoyî de "komîsyon" ronîya. Coka PKK'yî Kongreya xo ya 12. de qerarê feshkerdisî girewt, çekê xo verdayî û vêşnayî. Tewr peyên 26ê teşrîna verêne de Têgêrayîsê Azadî yê Kurdan eşkera kerd ke tayê komê gerîlayan Bakûrê Kurdîstanî ra peyser anjînê. Îta de ma vînenîme ke seba çareserîya demokratîke îradeyêko pîl est o. Gerek dewlete veng bido nê îradeyî. Xora eşkerayîye de kî ame vatene ke gerek qanûnê azadîye û entegrasyonê demokratîkî bivirazîyê. Êdî wezîfeyê dewlete dest pêkeno. Êdî verê çareserîye de astengîyî çin ê. Wa îqtîdar bi persanê seserre bêro têrî û gamanê şênberan bierzo. Dem demê hesabkerdişê weçînayîşan nîyo. Komelê Kurdîstan û Tirkîya ma sîyasetmedaran ra çareserîye û aramîye pîno. Ma kî gerek çik ke destê ma ra yeno bikerîme. Coka parlamento est o. Şar temsîlkaranê xo seba çareserîye çîneno we. Wezîfeyê ma yo juyin şarî rê xizmet o. Ma yo sîyasetê demokratîkî pîl bikerîme û bi fikrîyatê Birêz Ocalanî cuya hempare awan bikerîme. Paradîgmaya ma komelo demokratîko ke vera netewe-dewlete yeno formulekerdene yo.

***Sima fonksîyonê "Komîsyonê Piştîdayîsê Neteweyî, Wayûbirayîye û Demokrasî" yo ke binê serbanê parlamentoyî de ronîya çi fikrîyenê?***

Awankerdisê nê komîsyonî bêşik zaf muhîm û dîrokî yo. Dîroka Komara Tirkîya de reya verêne çîyo nîyanên beno. Xora sima kî zanê Birêz Abdullah Ocalanî bi israr waşt wa binê parlamentoyî de komîsyono nîyanên bêro ronayene. Çike o wazeno ke têyna ju partî nê, pêro partîyê ke parlamento de yenê temsîlkerdene tewrê prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî bibê. Armancê ey mabênê komelî de pêkerdis o. Nika ma vînenîme ke werteyê komîsyonî de 51 endamî est ê. Hetê temsîlîyetî ra problem çin o. Hama hetê kar kerdisî ra giran xebitîyeno. Gerek komîsyon hîna rew pêşnîyazanê qanûnan bikero. Heta nika 15 kombîyayîsî virazîyayî û demê nêzdî de kombîyayîsê 16. o bibo. Êdî Tirkîya û Kurdîstan de persê serekeyî zanîyenê. Heta nika xora komelî nê persî xeylêk reyî nîqaş kerdî. Bi mi hewce nêkeno ke hende kombîyayîşî bêrê viraştene. Ju kî komîsyon gerek bawerîya şarî bizedno. Tewr peyên mabênê kurdan de anket virazîyabî, goreyê nê anketî sera 80yê kurdan peştî dano prosesî, hama sera 40 bawer nêkeno. Çiqas ke komîsyon giran gurîno, hende bawerîya şarî gina war. Çîyo bîn kî komîsyonî vera zonê kurdî bêbawerîye viraşte. Sima kî zanê dayîka aştîye Nezahat Teke kombîyayîsê komîsyonî de gama ke kurdî qisey kerd, ameye astengkerdene. Nê reftarê komîsyonî bawerîya kurdan kêmî kerde. Rixmo ke zîyaretê Numan Kurtulmuşî yê Amedî de kurdî ameye qiseykerdene û parlamento de parekerdis bi kurdî bî, homa mabênê şarî de bêbawerîye est a. Xusûsî zîndanan de bi hezaran tepişteyê sîyasî est ê, seba înan heta nika gamêka şênbere nêerzîyaye. Gerek komîsyon wezîfeyê xo rew bîyaro ca û proseso huqûqî dest pêbikero.

***Komîsyonî heta nika Birêz Abdullah Ocalanî de pêdîyayîs nêkerd. Eke no pêdîyayîs bibo, çareserî rê kamcî feydeyê xo benê?***

Prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî de "aktoro serekeyî" Birêz Abdullah Ocalan o. Destpêk ra heta nika raye musneno, seba çareserîye kede dano, dewlete rê pêşnîyazanê muhîman keno û verê sîyasetê demokratîkî keno ya. Ju armancê xo est o, awankerdisê cuya demokratîk û têduşt o. Eke komîsyon wazeno nê armancî rê hetkarîye bikero, gerek raver şêro Îmrali û Birêz Ocalanî de bêro têlewe. Kîlitê çareserîye destê ey de yo. Gerek komîsyon tecrube û zanayîsanê ey ra feydedar bibo. Ey mîyanê 50 serran de xeylêk hukmat û îdarekarî dîyî. Atmosfer û awanîya sîyasetî zaf rind zano. Modelanê çareserîyê ke welatanê bînan de ameyî caardene nêzdî ra analîz keno. Senên ke Afrîkaya Başûre de muzakerevano serekeyî Nelson Mandela bî, îta de kî Birêz Abdullah Ocalan o. Senên ke Frederîk Klerkî Afrîkaya Başûre de Mandela de pêvînayîsî kerdî û pîya peynîya rejîmê aparheîdî arde, îta de kî gerek komîsyon Birêz Ocalanî de pêdîyayîs bikero û raya çareserîye bimuso. Êdî hukmat naye qebûl bikero ke, no proses bi serkêşîya Birêz Ocalanî raver sono.

***Sima nê prosesî de reftarê partîyanê muxalîfan senên ercnenê? Rolê înan ê komîsyonî qîm keno?***


Partîyê muxalîfê ke komîsyon de ca genê, heta nika reftarêko viraştox musna. Xususî CHP ser o xeylêk tedayî est ê. Rixmo ke na partî raştê operasyonanê hukmî ameye, prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî rê peştî dana. No seba ma muhîm o. Çike na partî ewro goreyê anketan partîya juyin a. Seke mi vat nê prosesî de "pêkerdiso komelkî" hewce keno. Eke partîyê muxalîfî tewrê ci nêbê, mîyanê komelî de qîymetê nê prosesî nêbeno. Tayê partîyê nîjadperestî xora peştî nêdanê nê prosesî û wazenê ke asteng bikerê. Ê wazenê ke na cografya de şer bibo, şerî ser o polîtîkaya xo dîyar kenê. Çekuyê aştîye, demokrasî û azadîye înan tersnenê. Na hişmendîye newe nîya, seserra XX. de na hişmendîye dewlete îdare kerd; kurdî, elewîyî û etnîsîteyê bînî qir kerdî. Qoçkirî, Zîlan, Dêrsim, Mereş, Çorum, Gazî bi destê na hişmendîye ameyî organîzekerdene. Ewro kî wazenê na polîtîkaya qirkere û înkarkere dewam bikero. Hama nê erdan de zaf çî vurîya. Paradîgmaya netewe-dewlete pûç bîye. Êdî Komara Tirkîya nêşîkîna estîya xo bi metodanê verênan dewam bikero. Nîjadperestî se kenê wa bikerê serkewte nêbenê. Ma yo destûr nêdîmî înan. Na seserre yo bibo seserra demokrasî û aştîye. Heta ke komara demokratîke yena awankerdene, têkoşînê ma yo dewam bikero.

***DBP nê prosesî de kamcî rolî kay keno? Bingeyê rêxistinkerdisî de prosesî rê senên peştî dano?***

Seke zanîyeno armancê Prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî hêzdarkerdisê sîyasetê demokratîkî yo. Ma kî zê DBP leteyê nê prosesî yîme û hermanê ma de baro giran est o. Hem Kurdîstan hem kî sûkanê Tirkîya yê bînan de gerek ma sîyasetê demokratîkî hêzdar bikerîme. Na çarçewa de xebatê ma zedîyenê. Xora ma hamnanî xeylêk kombîyayîşê şarî viraştî û prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî ser o tayê nîqaşî kerdî. Nê nîqaşî zaf feydedar bîyî. Çike no proses mabênê şarî de zêde nêzanîyeno. Coka vernîya ma de wezîfeyêko girs est o. Gerek ma şîyayîş û armancê nê prosesî rind zelal bikerîme.

# Ne ziman bê wêje, ne wêje bê ziman dibe

## Têkiliya yekemîn û herî girîng ku mirov bi ramanê derdibire bi ziman dest pê dike. Pira pêwendiyên civakî ya herî mayinde jî ziman e. Ramana ku bi ziman tê derbirin bi wêjeyê mayinde dibe



Adar Jiyan

Ziman bingeha hebûna wêjeyê ye û wêje jî xuyanga herî bilind a zimên e. Wêje wê pêwendiyê bi hest, hizir, hîs, bîr û hişmendiyeke domdar dixemilîne. Ji bo wê, ne wêje bêyî ziman û ne jî ziman bêyî wêjeyê dikare hebûna xwe bidomîne. Ev herdu hêmanên girîng hem sedema hebûna hevdu û hem jî encam û henaseya hevdu ne. Girêdana navbera herduyan tenê ne têkiliyeke ramanî û armancî ye; herwiha ew têkiliyeke hevparî, hevkarî, dubendî û dualî ya bivênevê ye jî

Li cihê ku yek lê kêm be, ya din jî bêdeng dibe, li cihê ku yek jê wenda dibe, ya din jî kor dibe. Ji duh heta îro ziman tenê ne pergalek e ku ji hêla mirovan ve tenê ji bo ragihandinê hatibe bikaranîn. Ew hilgirê raman, çand û nasnameya mirov a civakî, çandî û cîhanî ye jî. Mirov bi saya zimên cîhana ku lê dijî dinase û bi saya wêjeyê jî wateyê dide wê cîhanê. Ji ber vê yekê, ziman hem nexşeyek û hem jî neynikeke gerdûna hestiyarî û derûnî ya mirovan e. Wêje ew huner e ku di geliyên herî kûr ên vê nexşeyê de digere û bi saya zimên xwe di neynika gerdûnê de dibîne.

Heke ziman tune be wêje nikare teşeyekê bide hestan; heke wêje tune be, ziman nikare wan hestan watedar bike û bixemilîne. Dewlemendiya zimanekî bi kûrahiya wêjeya ku bi wî zimanî hatiye nivîsandin pêk tê û wateyê dibîne. Ziman ew ruh e ku di dilê wêjeyê de lê dide. Wêje jî hêza herî mezin e ku ziman zindî dihêle. Ji ber ku ziman di jiyana rojane de tê bikaranîn, hin caran difelişe, westar dimîne û bêwate dibe. Belê wêje ji bo ziman qadeke zindîbûn û dewlemendiyê ava dike. Wekî nimûne, helbestvanek peyveke asayî vediguherîne ronahiyekê; romannivîsek bûyereke herî girîng a dîroka mirovahiyê di hevokek sade de aşkera dike. Ev e ya ku derfet û fersendê dide ku peyv di ferhenga zimên de bi cih bibe. Her ku wêje sînorên ziman derbas dike, ew berfireh dibe. Her ku wêje ziman berfireh dike, cîhana mirovan a hundirîn jî berfireh dibe. Her ku ziman cîhana mirovan a hundirîn berfireh dike, peyveke nû giyanekî nû, hest û ramaneke nû jî li wêjeyê zêde dike.

Çawa ku zimanekî bê wêje dişibe xwezayek bêreng, wêjeyeke bê ziman jî dişibe gerdûneke bêdeng. Wêje bê ziman nayê xeyalkirin. Ji ber ku ziman hem materyal û hem jî amûrê wêjeyê ye. Pênûs ji bo nivîskaran, firçe ji bo wênesazan, amûrên muzîkê ji bo muzîkjenan çi bin, ziman jî ji bo wêjevanan ew e. Lê ziman ne tenê amûrek e; ew di heman demê de karakterek e. Her zimanek xwedî giyanek taybet e û muzîka wê ya hundurîn heye. Serketina nivîskarekî/ê bi bihîstina wê muzîkê dest pê dike. Eger tu bêyî têgihîştina xwezaya ziman, dengê wî, dînamîkên wî yên navxweyî binivîsî, peyv dibin tenê qalikekî vala. Wêjeya bê ziman mîna goristana peyvan e: hevok hene, lê giyanê wan tune ye.

Her gel û civak bi zimanê xwe cîhaneke hestî, giyanî û ramanî ava dike. Ziman avahîsazê derûnî yê şaristaniya gelan e. Ji ber ku wêje bîranîna zimên e, civaka ku zimanê xwe wenda dike, wêjeya xwe jî wenda dike. Wêjeya bê ziman wekî goleke çikiyayî/ziwa, zimanê bê wêje jî çemekî bê his û bê deng e. Zimanekî bê wêje wek dareke bê reh e. Ew tê axaftin lê bi pêş nakeve; tê hînkirin belê nayê hîskirin. Ji ber ku wêje bi berdewamî vejena zimên xurt û dewlemend dike, gava ku wêje tune be, ziman nikare xwe bigihîne dahatûyeke dewlemend. Ew ê tenê wekî dengvedaneke rabirdûyê bimîne. Bo nimûne, gotinên pêşiyan biwêj, stran, dûrik, zargotin, çîrok, çîvanok, pêkenok û hwd tunebûna, peyvên kurdî îro ewqas bi kûrahî û hestyarî mayinde nedibûn. Wêje tenê ziman naparêze; ew ziman diguherîne jî. Her nifşekî nû bi rêya wêjeyê zimanê xwe ji nû ve hîn dibe, bî kar tîne û hîn dike. Her berhemeke mezin a wêjeyî şoreşek zimanî ye. Di avakirina hevbeş a ziman û wêjeyê de; wêje ziman û ziman ji wêjeyê ji nû ve diafirîne. Ev çerxa pêvajoya afirîneriyê ya herî mezin e di dîroka mirovahiyê de roleke girîng dilîze. Ziman wekî axa ku wêjeyê xurt bike, wêje jî wekî barana ku wê axê berdartir bike.

Bîra hevpar a zimên, nasname û wêjeyê, ziman û wêje jî ne tenê ne ew warên estetîk in; ew tevnên herî kûr ên nasnameyê ne jî. Yek ji baştirîn mînakên vê têkiliyê wêjeya fransî ye. Awayên ku Victor Hugo, Flaubert, Baudelaire û Proust ziman veguherandiye, sînorên fransî bêdawî berfireh kiriye. Bi heman awayî, Shakespeare ne tenê îngilîzî bi kar aniye; wî ew afirandiye. Dewlemendiya îngilîziya îroyîn ji şoreşa wî ya helbestî ya zimanê wê tê. Di vê çarçoveyê de, her nivîskarê/a mezin, di bingehê de, avahîsazê zimanê xwe ye. Her hunermendek ku bi zimanê xwe yê zikmakî dinivîse dengê gelê xwe digihîne zimanê gerdûnî. Îspaniya Pablo Neruda, kurdiya Cegerxwîn tirkiya Nazim Hîkmet vê yekê baş diselimîne. Her yek ji wan, êş, berxwedan û kêfxweşiya gelê xwe veguherandiye ziman, ew ziman bi rêya wêjeyê nemir kiriye. Zimanek, digel wêjeyê, bîra xwe ya kolektîf jî diparêze. Ji ber ku her çîrok şahidiya serdemekê dike. Her helbestek berhevkirina hesteke mirovan e. Ziman tenê ne wekî navgînek axaftinê derdikeve holê; ew bi saya wêjeyê vediguhere hilgirê ezmûna jiyanî, bîr û hişmendiyê. Hêza nûjenker a wêjeyê di ziman de xwe dide der. Mayindebûna ziman bi ruhê nûjen ê wêjeyê ve girêdayî ye. Wêjeya nûjen bi şikandina qalibên zimannasî yên kevneşopî şêweyeke nû yê derbirînê diafirîne. Ev ne tenê nûjeniyek fermî ye, şoreşek rewşenbîrî ye. Ji ber ku firehkirina sînorên zimên tê wateya firehkirina sînorên ramanê; Wittgenstein gotiye: "Sînorên zimanê min sînorên cîhana min in." Îcar wêje jî, ji bo berfirehkirina wan sînoran rêya herî afirîner e. Di avakirina zimên de her peyvek wekî kevirekî, her hevokek wekî dîwarekî, her nivîsek wekî hêlînekê ye, û wêje jê di wê hêlînê de pêk tê, dijî û hebûna xwe didomîne.

Mirov bi zimanê xwe diramin, belê bi saya wêjeyê, kûrahiyê didin ramanên xwe. Ji ber vê yekê, nivîsandina bi zimanê xwe yê dayikê, ne hilbijartinek e; ji ber ku wêje li dijî şêweyên westar û neguherbar ên zimên serî hildide, ew wekî rê û rêbazeke hebûnê tê biakranîn. Ji ber vê yekê, her serdemeke edebî di heman demê de nûbûneke zimanî ye. Wêje ruhê ziman e. Her nifş hestên xwe bi awayekî cuda di ziman de nîşan dide. Ev guhertina di ziman de jî ji jiyanê tê. Ji ber ku ziman organîzmayeke zindî ye; ew ne statîk e, her gav dînamîk e. Ziman û wêje hem sedema vê dînamîzmê û hem jî encama wê ne.





Kamran Simo Hêdilî

# Wêje û ziman

Di wêjeyê de bikaranîna ziman an jî rola wêjeyê di pêşxistina ziman de: helbest, pexşan, stran, çîrok, roman, ceribandin, şano, sînema û hwd... Wêjehezên cîhanê bi sedan pirtûk li ser vê babetê bi zimanên xwe nivîsandine.

Lê heta ji min were, ez ê bi kurtî bêjim û ez ê bi pirsan dest bi şîroveya xwe ya li ser vê mijarê bikim.

Gelo wêjevan hestên xwe çawa derbasî xwendevanên xwe dikin? Bi awayekî din bipirsim, ew çawa dikarin xwendevan û temeşevanên xwe bikin şirîkên hest û ramanên xwe? Pirseke din, zimanê berhemên wêjeyî pê tên nivîsandin û zimanê wêjeyê çi bandorê li hev dikin?

Ji bo bersiva van pirsan rast were dayîn, pêwîst e mirov pêşî li dema kesên berhemên wêjeyî dixwînin, temaşe dikin an jî guhdar dikin, li rewşa wan a derûnî binêre.

Ya duyemîn; têgihîn, nêrîn, çavdêrî, awayê anîna ziman a xeyalan û bihêzbûna derbirînê hesab bike.

Ya sêyemîn; bikaranîna zanîna ziman di berhemên wêjeyî de ye. Heke mirov van mercan hemû li ber çavan bigire û bi cih bîne, di nirxandina xwe de mirov dikare tabloyeke serkeftî pêşkêş bike.

Mirovan bi peydakirina deng û bi axaftinê re wêje jî peyda kir. Li wê serdemê li ba zimanê axaftina rojane, xwezeya lê dihizirîn ji bo bandora xwe lê bikin û dîtinên xwe bêjin, zimanê sêhrî peyda kirin. Ev xisûsiyêta vî zimanî, bû pêşengê zimanê wêjeyê.

Afirandina berhemên wêjeyî, tê wateya zindîkirina xeyalan. Bi cureyekî din bêjim, rastî û xeyal bi hev re di berhemên wêjeyî de ten bikaranîn. Ev e ya zimanê wêjeyî ji axaftina rojane cuda dike û ziman dike giyanê wêjeyê. Ev zimanê biaheng, kelecana nav xwendevan û temaşevanan dilivîne û bandoreke bihêz li wan dike. Heke livîn û kelecan di berhema wêjeyî de nebe, temenê wê jî tune ye û bandorê li mirovan neke. Ji bo vê, Platon di danasîna helbestê de, gotina zimanê sêhrî bi kar aniye. Ji vî zimanê ahenga dengan re, zimanê sêhrê hatiye gotin.

Ya girîng di nivîsandina hemû cureyên berhemên wêjeyî de, ne gotinên tevlihev û hevokên dirêj in, gotinên kurt û hevokên derûnî bandora xwe zêdetir li ser mirovan dihêlin.

Li gorî min heta ji wêjevanan were, divê peyvan baş hilbijêrin û wan baş di cihên pêwîst de bi cih bikin. Heke pêwîst be yekîtiya çend peyvan çêkin û piştre hevoka xwe saz bikin. Ji ber ku wêjevan hêza xwe ji ziman digirin, hevîr û hevîrtirşê wan jî ziman e. Ziman jî ji hêmanên wêjeyê hêz digire û bi destên wêjenivîsan digihîje hêza afirandina derbirînê. Berhemên bi vê zanînê bên nivîsandin li ku dera cîhanê hatibin nivîsandin jî ti ferq nîne, dê xwe bidin xwendin. Berhemên bi naverok, xeyal, bi formê afirandinê, bi coşa hûnandina tevna dengan tên nivîsandin, xwe demeke dirêj bi xwendevanan didin xwendin.

Li vê rêwîtiya temenê dirêj, heke bandora xwe li ser mirovan hiştibin, di vê serkeftinê de para bi hostatî, bikaranîna ziman pir mezin e.

Berhemên wêjeyî bi xweşikkirina raman, hest, xeyal û zelaliya nêrînên wêjenivîsan, bêyî ku pasaport sînor nas bikin, xwe digihînin wêjehezên cîhanê.

Wêjenivîsên hosta, xeyalan bi gelek cureyan dertînin pêş. Bi hostatiya hilbijartina gotinan bi lihevanîna bikaranîna ziman, rastî û xeyalên xwe di nav hev de baş distirên û piştre pêşkêş dikin. Ya van hemûyan werdigerîne derbirînê peyvok in. Yên nirxandina deng bi hostatî nîşan didin û bandora xwe li me dikin ew in.

Zimanê wêjeyî, zimanê hemû cîhanê ye. Wê demê tiştên berhemên wêjeyî hemdem dikin û dikin zimanê cîhanê hûnandina ziman e.

Ji afirandinên di nav çalakiyên destpêka mirovan de cih girtî û heta roja me hatî, wêje ye û tişta afirandina wêjeyî hemdem dike û dike zimanê cîhanê, zanîna hûnandina ziman e.

Hûnandineke serkeftî bi gotinên xweşikkirî (estetîkkirî) dibe û divê her peyv di cihê xwe de were bicihkirin. Mirovan ev metod ji serdema pêşî ve bi kar aniye.

Ji ber wê tê gotin, formê nivîsê yê pêşî ku mirovan nivîsandî, formê helbestê ye. Bi vî awayî bûyer bi kêm gotinan tê nivîsandin û ev jî bûye bingeha zimanê wêjeyê.

Berhema herî xweş û serkeftî ew e ku nivîskar bi kêm gotinan mebesta xwe anîbe ziman.

Bêyî dirêjkirina mijarê divê bêjim ku ji serdema pêşî, heta serdema me, mirovan li derveyî zimanê têgihiştina rojane, zimanekî cuda afirandiye.

Ev ziman berhemên wêjeyî dike malê cîhanê.

Em dizanin tiştên berhemên wêjeyî ji wan pêk tên, hest û raman in. Tiştê yekem ê berhemên wêjeyî nemir dike jî, bi xweşikî bikaranîna ziman di hest û ramanan de ye.

Hestên mirov çiqas pir dibin bila bibin, ramanên mirov çiqas tûj û hêja dibin bila bibin, ya herî girîng bi zanîna ziman pêşkêşkirina wan hest û ramanan e. Bi kîjan zimanî were nivîsandin bila were nivîsandin, ji bo çi armancê dibe bila bibe, bi çi rêbazê dibe bila bibe, kîjan hest, raman, xisûsiyetên kîjan formî nîşan bide bila nîşan bide, tişta têgihiştina wêjeyê xweş dike û mirovan dilerizîne, ahenga dengan e. Wek mînak;

bêhna meynoşên ji êvarê mayî,

fermandarê artêşa xwe wenda kirî me ez.Lê ji bo rewşa xwe ya xirab ji xwendevanê xwe re bêjim, ez dikarim di helbesta xwe de welê binivîsim;

Negirî dayê nelorîne,

rondikên ziwa nebarîne.

Em van gotinan dikarin di berhemên xwe de bi kar bînin.

Ev hevok li Ewropa yan li Kurdistanê hatibe nivîsandin, mirov dizane ku bi zimanê wêjeyî hatiye nivîsandin. Ji ber bi zimanê guvaştî hatine nivîsandin, mirov pirtir dihejîne. Ev ziman dibe navenda pêşxistina ziman û xeyalên mirovan. Ev ziman bi şêweyeke li guhên mirov xweş were, bi hevokên lihevkirina gotin û muzîkê tê gotin. Ji ber wê ye ku li hişê xwendevan û temeşevan tê nivîsandin û bandorê li zimanê wan jî dike.

Wêje, çanda zimanên civatan xweşik û dewlemend dike.

Ziman, bi zimanê wêjevanan xweşiktir dibin, bêje zelal û gotin spehîtir dibin. Wêjevan bêje û gotinan bi kedeke mezin xweşik dikin di derhemên xwe de bi cih dikin û piştre pêşkêş dikin. Bi vî awayî hestên xwe derbasî temeşevan û xwendevanên xwe dikin û wan dikin şirîkên keser û şadiyên xwe.

Wêjevan dengan dikin stran û ramûsan. Carinan jî gotinan, dikin hawar, lorî û dikin rondikên çavan.

Ev deng di hest û ruhê mirov de dibin mîna gul û striyên gulan.

Berhemên wêjeyî, ne komkirina qelabalixa gotinên bêser û ber in. Wêjevan gotinan yekoyeko hildibijêrin û bi wijdan bi awayekî dadwarî wan di berhemên xwe de bi cih dikin.Hostatiya wêjenivîsan ew e ku her tîpê, her peyvê û her hevokê li cihê guncav dizanin bi cih bikin. Ew dizanin bi peyvan, ronahiya pêşveçûnê di hişê temeşevan û xwendevanan de pêbixin. Rengvedana hest û ramanê, hilpekandina mantiqê û di nav ziman de afirandina ziman çêbikin. Ji nivîsarên berhemên wêjeyî, qabiliyeta hevoksazî û fêrbûna hilbijartina peyvan, hunera peyvan ji dil ji wan tê xwestin. Felsefa berhemên wêjeyî zanîna ziman e. Bi rêya ziman nivîskar xeyal û ramanên xwe derbasî mirovan dikin.

Di berhemên wêjeyî de form, deng, wate û peyama wêjeyî, di guhertina hest û baweriyên mirovan de dibe pira veguhartine.

Nivîskarên berhemên wêjeyî, bi hevoksaziya xwe tixûbên di nav rastiya naveroka mijarê û awayê ragihandinê de radikin. Ev taybetmendiya zimanê berhemên wêjeyî, di giyanê civatê de bandoreke biqasî erdhejê çêdike. Raman, hest û têgihiştina civatê bi pêş ve dibe.

Zimanê nivîskar û têgihiştina mirovên civatê bi hev re sîstemekê ava dikin.

# Entegrasyona demokratîk û rola HSDê

**Ji bo di navbera rêveberiya xweser û hikûmeta demkî de li hevkirinek çênebe, çi ji destê Tirkiyeyê tê dike. Li gorî wê ger kurd û rêveberiya Şamê li hev bikin wê hesabên wê yên li herêmê hemû serûbin bibin**



Xweşkanî
Felemez Ulug

Bi hilweşandina rejîma Baasê re, 8ê kanûna 2024an, li Sûriyeyê pêvajoyeke nû dest pê kir. Di çarçoveya vê pêvajoyê de yek ji mijarên herî zêde tê nîqaşkirin hebûna Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) e. Bi taybetî dewleta tirk û hin welatên ku bi dijberiya kurdan tên naskirin, ji bo Sûriye li ser hîmê demokrasiyê û wekheviya gelan ji nû ve neyê avakirin, çi ji destê wan tê dikin. Bi hincetên cuda hebûna HSDê dike rojev, li gel vê rê nade ku rêveberiya HTŞê li Şamê bi Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Bakur û Rohilatê Sûriyeyê re li ser prensîbên bingehîn li hev bike. Ango rêya çareseriyê bi pêş bixe. Tevî van astengiyan jî, nirxandin ew e ku di çarçoveya entegrasyona demokratîk de HSD dikare di nav artêşa Sûriyeyê de cih bigire, bêyî ku ji hebûna xwe ya rêxistinî tiştekî wenda bike.

Entegrasyona demokratîk ne tenê yekîtiya leşkerî ye, lê bingeha avakirina artêşeke neteweyî ye ku li ser prensîbên demokrasî, wekhevî û rêveberiya hevbeş ava bibe. HSD, ku di şerê li dijî DAIŞê de bi roleke sereke rabû, wekî hêzeke ku ji pêkhateyên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tê, tê dîtin ku bingeha vê artêşa nû ye. Di vê çarçoveyê de, tevlîbûna HSDê tê wê wateyê ku hêzên kurd, ereb, suryan û yên din ên herêmê ne tenê di bin fermandariya navendî de bin, lê herwiha mafên xwe yên çandî, siyasî û rêveberiyê jî biparêzin. Ev pêvajo, ji adar 2025an ve mijara danûstandinan e û niha jî lîsteyeke fermandarên HSDê (nêzîkî 70 kes) ji bo entegrasyonê hatiye pêşkêşkirin. Armanc, ne wendakirina desthilatdariya herêmî, lê entegrebûna wê di pergaleke federal (nenavendî) de ye ku pêşî li parçebûna welêt bigire û li dijî terorê bibe hêzeke sereke.

Rayedarên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohilatê Sûriyeyê, vê mijarê bi erênî dinirxînin, lê bi şertê ku entegrasyon demokratîk be û mafên pêkhateyan bên parastin. Rêveberiya xweser, di daxuyaniyên xwe de, gelek caran teqez kir ku "HSD wê bibe bingeha avakirina artêşa Sûriyeyê" û entegrasyona demokratîk dê "di navbera hemû pêkhateyan de" pêk were. Ev pêvajo ne teslîmkirina çekan, lê avakirina pergalekê ye ku dikaribe neteweyî de biparêze. Bêguman, ev gaveke girîng e ji bo paşeroja Sûriyeyê, ku hemû alî tê de cihê xwe bigirin. Di heman demê de, rewşa yekîneyên jinan ên di bin sîwana YPJê de û parastina mafên komên cuda di çarçoveya entegrasyonê de tên nirxandin. Bawerî ew e ku ev pêvajo li gorî modela demokratîk a Rojava-yî be, ku komun û rêveberiya hevbeş bingeha wê ne. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê îşaret pê dike ku bêyî vê entegrasyona demokratîk, pêvajoya veguhêz ne mimkun e biçe serî.


Beşdariya HSDê ya nav artêşa Sûriyeyê, ji bo silametî û aramiya herêmê jî xwedî girîngiyek mezin e. Bi taybetî, dema mirov li tecrûbe û têkoşîna bi îstiqrar a HSDê binêre ku li dijî komên çete bi dest xistiye, wê ev tecrûbe ji bo bihêzkirina artêşa Sûriyeyê ya nû jî bibe çavkaniyeke xurt. Entegrebûna HSDê ya di nav artêşê de, divê di çarçoveya qanûnî û hiqûqî de pêk bê. Li gel vê, ya herî girîng ew e ku divê statuya herêmên bakur û rojhilatên Sûriyeyê jî were zelalkirin. Rêveberiya demkî ya Şamê bêyî ku bi nûner û rêveberiya herêmê re li ser vê mijarê biaxive, ango danûstandinekê bike, yekser mijarên leşkerî anîne rojevê. Ev nêzîkatî ji bo silametiya pêşeroja herêmê gef e.

Pir aşkere ye ku hebûna HSDê ji bo herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê pir girîng e. HSD pêşiya êrişên komên çete yên li ser herêmê digire. Lewma bêyî entegrasyona demokratîk beşdariya HSDê ya di nav artêşê de, wê bibe sedem ku herêm bê parastin bimîne. Ev yek dê pêşî li êrişên ser herêmê vebike. Lewma girîng e ku bêyî pêkhateya rêxistinî û rêveberiyê bê guhertin, beşdariyek çêbibe wê ne tenê ji bo herêmê, ji bo tevahiya Sûriyeyê jî bibe hêza parastinê.

Lê diyar e ku hin alî hene ji vê aciz in. Rayedarên dewleta tirk gelek caran hebûna HSDê ji bo xwe wekî metirsiyekê bi nav dikin. Her kes ango kesên ku li ser meseleyê serê xwe diêşînin dizanin ku derdê dewleta tirk ne HSD ye. Derdê wê statuya gelê kurd e. Dewleta tirk û zîhniyeta wê ya îradeya kurdan ji înkarê tê naxwaze li Sûriyeyê jî kurd bibin xwedî îrade. Ji ber vê yekê, bi destê komên çetey êrişî herêmê dike da ku bê îstiqrariyê çêbibe û ji bo xwe derfetan ava bike. Lê ji despêka Şoreşa Rojava ve gelê herêmê bi rêveberiya xweser bawer e û bi van dek û dolabên dewleta tirk dizane.

Dewleta tirk hewl dide bi hebûna xwe ya li herêmê, reveberiya demkî ya Şamê têxe bin bandora xwe. Wisa diyar e ku rêveberiya Ahmet El-Şara jî nikare xwe zêde ji Tirkiyeyê dûr bigire. Lewma di mijara kurdan de kêm be jî li gorî daxwazên Tirkiyeyê tevdigere. Ev yek ne tenê li ser kurdan li ser tevahiya Sûriyeyê gefek e. Ji bo di navbera rêveberiya xweser û hikûmeta demkî de lihevkirinek çênebe, çi ji destê Tirkiyeyê tê dike. Li gorî wê ger kurd û rêveberiya Şamê li hev bikin wê hesabên wê yên li herêmê hemû serûbin bibin. Ji ber vê yekê her tim bi sûcdariyên cuda dev davêje HSDê û hewl dide pêşî li tevlîbûna di çarçoveya entegrasyona demokratîk a di nav artêşa Sûriyeyê de bigere.

Herwiha em dikarin bêjin ku di vê rewşa aloz a siyasî de tevlîbûna HSDê ya nav artêşa Sûriyeyê, tê wateya misogerkirina çareseriyeke siyasî ya mayinde ji bo kurdan û pêkhateyên din. Dîsa tê wateya parastina destkeftiyên rêveberiya xweser bi rêya hêzeke leşkerî ya di çarçoveya dewleta Sûriyeyê de. Lê belê, heta ku lihevhatineke siyasî ya berfireh di navbera rêveberiya xweser û Şamê de li ser mijarên wekî xweserî, pergalên îdarî û parvekirina desthilatdariyê çênebe, ev tevlîbûn wê tenê wekî pêşniyareke siyasî bimîne. Ew gaveke wisa mezin û hesas e ku hem dikare li Sûriyeyê dawî li şer bîne hem jî bibe sedema şerekî nû.



Zinar Ronî

# 'Misogeriya ti tiştî tune ye'

Rêveberiya Tevgerê bi daxuyaniyekê diyar kir ku wan mekanîzmaya paşvekişandina gerîlayan a ji Tirkiyeyê daye destpêkirin. 25 gerîlayên ku ji Tirkiye û Bakur vekişiyan jî li daxuyaniyê amade bûn.

Piştî daxuyaniyê hem ji aliyê rayedarên desthilatê hem jî ji aliyê hevserokên DEM Partiyê ve daxuyanî hatin dayîn. Rayedarên desthilatê destnîşan kir ku êdî pêvajo derbasî asteke din bû. Lê dîsa pêvajo wekî "Tirkiyeya Bêteror" bi nav kir. Rayedarên destihlatê div ê gotinê de israr dikin. Ew bi israr nabêjin ku ew ê meseleya kurdî çareser bikin. Hevserokên DEM Partiyê jî anî ziman ku pêvajo derbasî merheleyeke nû bûye. Merheleya nû jî wekî 'merheleya duyemîn' bi nav kir. Hevserokê DEM Partiyê Tuncer Bakirhan di civîna xwe ya li Qersê de wiha got: "Di vê qonaxê de, qonaxa yekemîn a pêvajoyê bi dawî bû. Piştî biryarên kongreyê, şewitandina çekan û temamkirina vekişînê, rûpeleke nû vebû. Niha, dem hatiye ku em li benda çareseriyê nemînin, em çîroka xwe bixwe binivîsin. Dem hatiye ku em derbasî qonaxa duyemîn a hîn krîtîktir û girîngtir bibin û bi gavên qanûnî û siyasî aştiya civakî bi dest bixin."


Di van hevokan de behsa qodên merhaleya duyem jî tê kirin. Li gorî vê divê di qonaxa duyemîn de bi gavên hiqûqî û siyasî aştiya civakî bê bipêşxistin. Mixabin desthilat hê jî baş ne di vê ferasetê de ye. Serokê meclisê û komîsyona li meclisê Numan Kurtulmuş her çiqas paşvekişandina gerîlayan wekî geşedaneke girîng binirxîne jî, dîsa mijarê hewaleyî hêzên ewlehî û îstixbaratê dike. Wisa xuya ye ku meclis yekeyek naxwaze berpirsiyariyê bigire ser xwe.

Tevgera Azadiyê ji bo pêşiya provakasyonan bigire, biryara paşvekişandinê dixe meriyetê lê desthilat hê jî mijarê di çarçoveya ewlehî û îstixbaratê de digire dest. Rastiyek heye ku bi hêzên ewlehî û îstixbaratê pêşketin çênabe. Mijareke ku hêzên leşkerî û îstixbarî di nav de bin her tim îxtimala xerabûnê heye.

Paşvekişandin ji du aliyan ve girîng bû. Yekemîn, ji bo pêşiya provakasyonan were girtin. Di daxuyaniyê de tê ziman ku ji bo rîska pevçûn û şer ji holê rabe ev gav hatiye avêtin. Duyemîn, ji bo pêşiya çareseriyê bê vekirin. Ev demek e pêvajo li ber xitimandinê bû. Tevgera Azadiyê ji bo lezê bide pêvajoyê ev gav avêt. Rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan ji sih salî zêdetir e ku li çareseriya demokratîk digere. Ev gavavêtin û israr jî nîşaneya vê xwestekê ye.


Li gorî daxuyaniyên desthilatê hemû tişt li gorî hesabên hatine kirin dimeşe. Lê di rastiyê de rewşa xuya dike ne wisa ye. Rastiya aliyekî nayê dîtin. Qeyrana li Rojhilata Navîn hê jî her diçe kûrtir dibe. Her kêlî hesabên tên kirin diguherin. Li nav Tirkiyê bixwe jî qeyrana siyasî û aborî kûrtir dibe. Desthilat her çiqas bêje 'daraz serbixwe ye' jî nikare raya giştî îqna bike ku operasyonên li ser şaredariyên CHPê hiqûqî ne. Ev operasyon bertekên li hemberî pêvajoyê jî mezintir dikin. Li aliyê din jî lêgerînên Tirkiyê yê standina çek, cebilxane û balafirên şer baweriya bi pêvajoyê kêm dikin. Her wiha 3 salan dirêjkirina tezekereya şandina leşkeran a ji bo derveyî sînor jî pêvajoyê ji provakasyonan re vekirî dihêle. Hêj gelek sedemên din jî dikarin lê werin zêdekirin.

Desthilat her roja ku zagonên hiqûqî dernaxe û di hin rêziknameyan de guhertinan pêk nayne, pêvajoyê ji provakasyonan re vekirî dihêle. Bi hevdîtinên li pişt deriyan û hevdîtinên bi birêz Abdullah Ocalan ên sînorkirî re êdî pêvajo nayê meşandin. Karakterê çareseriya pirsgirêkên bi vî rengî li gorî merhaleyan diguhere. Heya niha meşandina bi awayê veşarî dibe ku hewce bû. Lê êdî divê zemîna rewa were avakirin. Aliyê kurdan ev zemîn rewa çêkiriye. Gelê Kurd gavên şênber davêjin. Lê desthilat hê jî pêşiya rewabûna pêvajoyê bi tevahî venekiriye. Dixwaze demê dirêj bike. Ev jî pêvajoyê dixe xetereyê. Heya niha gelek gavên erênî hatin avêtin ji aliyê kurdan ve, lê her kêliya ku desthilat gav navêje xetere mezintir dibe. Lewma misogeriya ti tiştî tune ye ku bi vî awayî pêvajo bimeşe. Ji bo mîsogeriyê, divê zagon bên guhertin û mafê kurdan ên hatine înkarkirin, bi zagonan bên têkuzkirin. Bi zagonan bên parastin. Nexwe dê mîsogeriya tu tiştî nebe.



# Dermanê mêjiyê nexweş demokrasî ye

## Erdogan û Bahçelî di mijara Xezayê de, tofan rakir, lê di pêvejoya “Aştî û Civaka Demokratîk” de, bi “Libasên serdema navîn” û destpêka “Avakirina dewleta Enqereyê” hereket dikin



Medenî Ferho



Kurd di ezmûnekê de ne. Ev ezmûn, pêkanîna demokrasiyê ye û di dîroka mirovahiyê de karê herî zor e. Em serdema “Ummet” a Osmaniyan hesab nekin; dîroka sed salî ya çêkirina nasname û neteweya “tirkî”, yanî dewleta Tirkiyeyê, ji demokrasiyê dûr e. Bi bûyerên trajîk dagirtî ye. Desthilatdarî, burokrasî, îstîxbarat û artêş weke aşê tunekirinê kar dikin. Ev zihniyeta “saqit” û “seqet”, bi tî awayî bi demokrasî û edaletê şerebyab nebûye. Her tim, teokrasî-ola yek milletî, li ser bingeha “bîad” û “bendetiyê” bi pêş xistine.

Di destpêka avakirina dewleta Enqereyê de, laîsîzma yekperest hebû, piştre darbeyên leşkerî destpêkirin; 22 sal in jî “manîfaktûr diktatorî” heye. Ev jî tê wateya sîstem û hêza di yek destî de û “îstîbdad-despotîzm” a veşarî û baxçeyên gelan, bax û bostanên demokrasiyê talan dikin.

Qesra Kulliye bûye navenda vê talanê. Serokkomar Erdogan, hîn di serdema şaredariya Stembolê de, di civînekê de axivîbû û gotibû: “Demokrasî ji bo me ne armanc e. Amurê bikaranîn û gihiştina armancê ye.” Ev vîdeo, ji aliyê Ahmet Nesîn ve di medyaya civakî de hat weşandin.

Erdogan jî, hevparê wî yê biçûk Dewlet Bahçelî jî, di her fersendê de gotina “ebed-muebbed dewlet” û “ebed-muebbed desthilatdarî”yê tînin ziman. Her du gotin, ji sonda dewşirmeyên pençîk, “qehr, hêrs û şûrê me ji bo dijmin, bendetiya me ji bo siltan” hatine çêkirin û bûne bingeha faşîzma netewperestiya sed salî.

Ev diruşm, bi navê îslamê, kuştina hişmendiya “tevhîd”ê ye. Tevhîd bingeha baweriya bi “yekxweda”yî û bingeha ola Îslamê ye. Baweriya pençîkên dewşirme, weke di diruşma wan de jî xuya ye, tiştekî din e. Sed sal in, “anasir-i îslam”, “qewmên cuda-nasnameyên cuda” tên înkarkirin û tunekirin. Her kes mecbûr e bibe “turkê esîl”, ev esaletek çêkirî ye û berhemê dewşirme Ziya Gokalp e! Ev zihniyeta “seqet” û “saqit” ji têgihiştina demokrasî, edalet û wekheviyê dûr e.

Mîmar û endezyarê pêvoya çarseriyê Abdullah Ocalan jî, înîsiyatîfa bi navê “Aştî û Civaka Demokratîk” danî holê û da xuyakirin ku ji bilî demokrasî, xwişk û biratiya gelan, edaleta bi wekheviyê tî rêyên din li pêşiya dewleta Enqereyê nema ne. Divê xeşîmtiya sîstema dewşirmeyan were terkkirin. Lê “enasirî turk”, dîsa bi zihniyeta kufikî, nav guhert, “hevkariya neteweyî, xwişk û biratî û demokrasî” li pêvejoyê kir.

Abdullah Ocalan, bêyî ku li dijî guhertina nav derbikeve got; “Ji bo serkeftina pêvejoyê, divê hemû derdorên siyasî yên li Tirkiyeyê, bêyî ku teng bifikirin, hesabên partî û kesayetî bikin, înîsiyatîfê bigirin û pozîtîf tevlî pêvejoyê bibin û serketinê misoger bikin.”

Ev bang tê wateya berpirsiyariya dîrokî û barê pêkanîna aştî û demokrasiyê datîne ser milên her kesî. Lê, dubarekirin-naqarata “aksiyom” dewam kir û dike. Bi taybetî piştî hilbijartinên Qibrisê, (19ê cotmeha 2025an) û serketina alîgirê çareseriya federasyonê Tufan Erhurman; Dewlet Bahçelî, weke “qadirî mutlaq” hilbijartin red kir û daxwaz kir ku Meclisa Bakurê Qibrisê demildest bicive û bakurê Qibrisê bajarekî weke eyaleteke Tirkiyeyê ragihîne. AKPê jî aşkere kir ku daxwaza Dewleta Bahçelî daxwaza wan e jî.

Gelo ji bo vê helwestê, ji bilî gotina “aksiyom” gotineke din dikare were bikaranîn? Di vê serdemê de ku têgihiştina kumulatîf û dîtin û ferqkirinek kumulatîf û pêkanîna guhertinan ferz, ev feqîrî û lewaziya mêjî balkêş e!

Ocalan dibêje; “Ji bo Tirkiyeyê û herêmê dem dema aştî, demokrasî û wekheviyê ye”. El heq! Mixabin, helwesta komisyonê ya salekê û helwesta rayedarên desthilatdarî û dewletê ku gotinên xwe yên derbarê birêz Abdulah Ocalan û “mafê hêviyê” de bi cih neanîn. Berovajiyê vê, bi gotinên derbarê Qibrisê de xuya bû ku di ferhenga wan de “demokrasî”, “biratî” û “aştî” nîne. Ji bo vê jî min destpêkê got, “Bar û ezmûna kurdan giran e.”

Desthilatdariya Qesra Kuliyeyê, demokrasî nake armanc, dike amûrê gihiştina armanca xwe. Jixwe, “Qesra Kuliyeyê”, beramberî seltanata Çankayayê ya “ata” û “şef”tiya “sekuler”îzmê hat ava kirin û bûye qesra “xelîfetî”yê ya veşarî. Serokkomar Erdogan, heta radeyekê bi serket û nêçîra dawî ya li dijî CHPê jî, di vê wateyê de hatiye destpêkirin. Piraniya entelîjansiya Tirkiyeyê jî weke destpêka avakirina dewleta Enqereyê, li dora qesrê kom bûye, di himbêza vê bextreşiyê de, bi dengekî şikestî û dengekî nexweşiya li ber zikratê derdixe.

Erdogan û Bahçelî di mijara Xezayê de, tofan rakir, lê di pêvejoya “Aştî û Civaka Demokratîk” de, bi “Libasên serdema navîn” û destpêka “Avakirina dewleta Enqereyê” hereket dikin. Erdogan ji mutewazîbûn û têgihiştina dîroka nêzî xwe û azmûnên pêvejoyên çareseriyên beriya niha dûr hereket dike; Dewlet Bahçelî jî, bi sefaleta mêjiyê serdema antîk û tarîtiya “9 tîrêjên” Turkeş hereket dike. Ev sefaleta serdemên berê ye û wijdanekî birîndar û tevizî ye. Xuya ye ku Bahçelî “mecbûren û tedrîcen” ew gotinên dexaleta li gel Ocalan bi kar anîn. Mecbûriyet, ji ber rewşa dawî ya li herêmê û cîhanê bû; “tedrîcen” jî hêdî hêdî, gav bi gav ber bi armanca xwe ya dek û dolaban, xap û rîpan çûyîn e.

Ev rewşa sergerdeyê Îttîhadî Cafer û xwînxwarê Teşkîlatî Mahsuse Xalit Paşayê dîn û kujer Topal Osman e!

Ev zewatên şerê “gayrî nîzamî” ne, makîneya sûc bûn, deshilatdariya Stembolê jî ji bo derdestkirinê li wan digeriya! Ev zewat ji aliyê dewleta Enqereyê ve hatin “talîf” kirin. Sakalli Nureddîn Paşa jî kirin serfermandarê artêşa nû, Topal Osman bû parêzerê Mustafa Kemal!..

Vêca, Abdullah Ocalan, ev rewş tev li ber çavan girt, şerê Milazgirê kir mînak, bi parzûnkirina dîroka demdirêj a mirovahiyê û bi hişmendiyeke civaknasî, gaveke dîrokî avêt. Akademisyenê Kanadayî Prof. Dr. Peter Mclaren, di axaftina xwe de ku bi ANFê re kir, 23yê cotmeha 2025an, cesareta rêber Ocalan silav kir û bang li rayedarên dewleta tirk kir ku ji demokrasî û aştiyê netirsin. Lê cesaret rewşeke têgihiştin û demokratbûnê ye; hunera demokrasiyê jî ne hêsan e û têkildarî zanistê ye.

Helwesta dewlet û desthilatdariya Tirkiyeyê ji matametîk û felsefeyê dûr e. Kurd, ji bo kesên wiha dibêjin; “Doh çi bin, îro jî ew in”…

Nexeşaya îro li Tirkiye û bakurê Kurdistanê, dîmenê emperyalîzma Îngilîstan û dagirkirina Îrlandayê ye… Nexşeya duyemîn jî, dîmenê neteweperestiya Apratheid û têkoşîna Kongreya Neteweyî ya ANCê Başûrê Efrikayê ye.

Gelek lêkolîner, rojnamevan û akademîsyen têkoşîna Başûrê Efrikayê û Nelson Mandela, ji bo Tevgera Azadiya Kurd û Abdullah Ocalan, beramberî hev dikin û dibêjin: ‘’Nelson Mandela hat azad kirin û pirsgirêka li Başûrê Efrîkayê çareser kir; eger Ocalan were azad kirin wê pirsgirêka li Tirkiye û bakurê Kurdistanê çareser bike.’’

Du cudahî hene: yek, mîratzedeyên paşayên celad, mînakên li cîhanê li ber çavan nagirin; du, li pişt aştiya navbera Îngilîstan û Îrlandayê û li pişt aştiya Apartheid û ANC-Mandela Ewropa hebû. Li hember pêngava çareseriya “aştî û civaka demokratîk” a li Tirkiye û bakurê Kurdistanê cîhan bêdeng e!.. Evropa, banga rêber Ocalan û biryara PKKê ya rawestandina şer û bêçekbûnê bi şênberî pêşwazî kir, lê ji bo gavavêtina dewlet û desthilatdariya Tirkiyeyê, dengê xwe nekirin.

Tenê Swîsreyê ragihand ku eger alî, bi taybetî Tirkiye bixwaze, ew amade ne naybeynkariyê bikin û gotin ku tecrûbeya wan jî heye.

Lê bextreşiya kurdan, pergala dewşirme ye û naşibe tu pergalan. Ne “îstikbala hundir”, ne “îstikbala derve” têra wan dike. Ew berhemê “tehcîr”ê û xwedîkirina “sêwîtî” ya di zembereka “tanzîma” qijleyê de û “diranê çerxa şer” in. Ew demokrasî û aştiyê wekî têkçûna xwe dibînin.

Li cîhanê, ti dagirkeriya hêzên kapîtalîst, mustemleke û pergalên faşîstan, zarokên gelan di rengê pergala dewleta Enqereyê de wekî “mankurt” perwerde nekirine. Ev hişmendiya “seyyar û “seyyal” tenê li cem paşayên Îttîhad û Terakkî heye. Seyyar, kesên bê cih û war in, seyyal jî kesên di nav tevgera “şer”de ne. Her du bask jî, hêzên mîlîter û çete esas digirin.

Bawerî girîng e. Dewlet û desthilatdariya Tirkiyeyê, li gel çeteyên cîhadîst cih digire, wan xwedî dike û berê nav ser û guhên kurdan dide. Li aliyê din, ji bo kurdên li Suriyeyê mafên xwe bi dest nexin, desthilatdariya HTŞê jî sor dikin.

Zanist û siyasetmedarên cîhanê; hem paradîgmaya Abdullah Ocalan wekî çavkaniya pirsgirêkan vedibêjin; hem Rêveberiya Xweser a Rojava mînak nîşan didin. Ya herî giring jî pêvejoya aştî û çareseriya li bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê silav dkin. Eger, dewlet û desthilatdariya dewleta Enqereyê, layiqî wan nebe, ev tê wateya ku xeşîmî û cehaleta sedsala navîn serdest e û pêdiviya wan bi mamosteyekî heye.

Ew mamoste jî kurd in, siyaseta kurdan e, Tevgera Azadiya Kurd û Serokê Tevgera Azadiya Kurd e. Vêca kurd dibêjin, siyaseta kurd û Tevgera Azadiya Kurd diaxivin, serokê Tevgera Azadiya Kurd jî hem diaxive, hem dinivîse, hem nîşaş dike. Zor be jî kurd bi israr in ku mêjiyê nexweş, bi demokrasiyê tedawî bikin.

# Serokwezîra Japonyayê ya yekemîn Sanae Takaichi

Kurdistan Lezgiyeva



Piştî dewreyeke din a krîzên siyasî, ku bi hilbijartinên nakok û hilweşîna koalîsyona desthilatdar re hat, serokwezîra japonî ya nû, Sanae Takaichi, dest bi kar dike. Nêrînên wê yên muhafazakar bi yên her endamekî Partiya Lîberal a Demokrat (LDP) ya Japonyayê re reqabetê dikin. Ew berê wekî yekemîn jina ku posta seroka dewletê digire dîrok nivîsandiye. Ew ji nêrîna “burokratek rehet li ser kursiyek rehet” dûr e, wekî ku rêberên berê hatine wesifandin.

Tê payîn ku Sanae Takaichi gelek pirsgirêkan çareser bike: ji pirsgirêkên aborî û koçberiyê bigire heta siyaseta navxweyî ya partî û siyaseta derve. Serokwezîra nû û kabîneya wê dê neçar bimînin ku qeyraneke siyasî ya navxweyî, nehevsengiyên avahîsaziyê di aboriyê de û zêdebûna aloziyên herêmî, bi taybetî yên têkildarî Kore û Taywanê û têkiliyên bi Çînê re, çareser bikin. Bi vî awayî, Takaichi di serdemên herî tevlihev û nakok ên dîroka nûjen a Japonyayê de barê desthilatdariyê hildigire.

Wê ne realîst be ku mirov hêvî bike ev hemû armanc di serdemekê de werin bidestxistin, bi taybetî ji ber bêîstîqrariya xwerû ya şaxa rêveberiyê ya japonî. Lê belê, jixwe aşkere ye ku Takaichi dê di dîroka siyasî ya japonî de cihekî girîng bigire, bi piranî wekî sembola tolhildana muhafazakar û vegera ser rêya serdema ‘’Abe’’. Tevlîbûna Toshimitsu Motegi di kabîneya nû de xwestekek nîşan dide ku mirov xwe bispêre personelên îsbatkirî û berdewamiya sazûmanî bidomîne. Ev gav ne tenê daxwazek ji bo îstîqrara siyaseta derve, lê niyetekê jî nîşan dide ji bo vegera yekîtiya navxweyî ya LDPê.

Zû ye ku mirov biaxive li ser guhertinên têkiliyên ardîkal ên di navbera Tokyo, Pekîn û Moskowê de, an jî guhertinên



polîtîkayê yên muhtemel ên li hember Seoul û Washingtonê. Lê belê, tevliheviya daxuyanî û biryarên personelan nîşan didin ku serdema nû ya “Abe 2.0” dest pê dike- rêyek muhafazakar û pragmatîk ku li ser xurtkirina ewlehiya neteweyî û hevpeymaniyên berê disekine. Ji bo Rûsyayê, pêşveçûnek wisa dikare derfetên ji bo domandina diyalogê vebike ku cudahiyên stratejîk biparêze, tiştek ku jixwe bi daxuyaniya Takaichi ya li ser pêwîstiya çêkirina peymana aştiyê bi Rûsyayê re qismî piştrast kiriye.

Bi dengdana xwe ya ji bo Partiya Sanseito ya rastgir a tundrew, tîrmeha 2025an, bi slogana “Berî her tiştî Japonya!”, japoniyan piştgirî da Takaichi. Piştî hilbijartinê nerazîbûnek giştî çênebû, ji ber ku Takaichi bi rojeva heyî ya hilbijêran re li hev dike. Mînak, serokwezîr di axaftineke xwe de got: “Divê em siyaseta xwe ya kişandina hejmareke mezin ji biyaniyan ku ji me û çanda me pir cuda ne, ji nû ve binirxînin.”

Takaichi di demek nêzîk de dê bi ceribandina xwe ya dîplomatîk a mezin a yekemîn re rû bi rû bimîne: Donald Trump di dawiya cotmehê de serdana Tokyoyê kir. Piştî serokwezîr beşdarî civîna bilind a Hevkariya Aborî ya Asya-Pasîfîk (APEC) li Seoulê bû. Tê gotin ku hevdîtina bi serokê amerîkî re erênî bûye. Ji ber ku her du rêber jî li ser serweriya neteweyî û nirxên kevn, nêrînên wekhev par ve dikin. Seroka kabîneyê Minoru Kihara got, “Ev hevdîtin dê ji bo xurtkirina bêtir hevpeymaniya Japonya-DYAê pir girîng be.” Lê belê, beşdarbûna di civîna bilind a APECê de, dibe ku ceribandinek dijwartir be. Tê zanîn ku şandeya Rûsyayê amade ye. Lê zû ye ku mirov li ser îhtîmala têkiliyên rasterast di navbera Moskow û Tokyoyê de nîqaş bike.

# Qedexekirina ziman binpêkirina mafan e

Piştî dagirkirina Efrînê ji gelek hêlan ve guhertin û qedexe li hember çand û zimanê kurdî hatin bipêşxistin. Li gorî agahiyên ji herêmên hatin bidestxistin, bi destpêkirina sala xwendinê ya 2025-2026an re zimanê kurdî li dibistanên Efrînê hatiye qedexekirin

Role Mihemed




Li Efrînê zimanê kurdî ji perwerdeyê hat rakirin û îsal bi dehan zarokên Efrînê ji zimanê xwe yê dayikê bê par man. Li hember qedexekirina zimanê dayikê xelkên Efrînê û mamosteyên dibistanan daxwaza vegerandina zimanê kurdî kirin. Li aliyê din jî gelek bertekên mamoste û partiyan ji bo rawestandina zimanê kurdî derketin pêş.

Piştî dagirkirina Efrînê, ji gelek hêlan ve guhertin û qedexe li hember çand û zimanê kurdî hatin bipêşxistin. Li gorî agahiyên ji herêmên hatine bidestxistin, bi destpêkirina sala xwendinê ya 2025-2026an re, zimanê kurdî li dibistanên Efrînê hatiye qedexekirin. Li gorî hin daneyan jî, di nav gund û navçeyên bajarê Efrînê de bi dehan mamosteyên zimanê kurdî hene. Di dîroka neteweya kurd de her tim ziman û çanda wan hatiye asîmilekirin. Gelê bakurê Kurdistanê li dijî polîtîkayên qedexekirin û qirkirina zimanê kurdî, bi salan e li ber xwe didin ji bo mafê xwe yê rewa zimanê kurdî bi dest bixin. Tiştê ku niha li Efrînê tê kirin, di heman demê de rewabûna zimanê kurdî di destûra Sûriyeyê ya nû de ji hev ne qut in. Armanc yek e û helandina çanda kurdî ye.

Ji destpêka salê ve mamoste û pirtûkên bi zimanê kurdî amede ne. Mamosteyan amadekariyên xwe ji bo vekirina dibistanan kiribûn. Lê di rêbaza xwendinê ya îsal de dewleta tirk zimanê kurdî li dibistanan rakir û di fêrkirinê de zimanên weke tirkî, îngilîzî û erebî kir esas. Ji sala 2018an ve, dewleta tirk Efrîn dagir kiriye, çekdarên girêdayî wî rojane li ser xweza, çand, dîrok û darên zeytûnê yên şêniyan kiryarên binpêkirinên dijmirovî dikin.

Herwiha piştî dagirkirina çekdaran dest bi guhartina demografya Efrînê kirin. Gelek dibistan ku cihê fêrkirinê bûn, tê de kesên ne resen bi cih bûn. Li gorî amaran jî li Efrînê guhertina demografîk ji sedî 75an derbas kiriye. Li Efrîna dagirkirî, zimanê kurdî di gelek pêvajoyan re derbas bû. Beriya Efrîn were dagirkirin, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Akademiya Zanistên Civakî ya Mezopotamyayê û yekemîn zanîngeh li Efrînê hatibû vekirin. Sîstema perwerdeyê rûniştî bû, zanîngeh û dibistanên zimanê kurdî hebûn. 6ê cotmeha 2011an dibistana yekemîn bi navê Şehîd Fewzî li gundê Diraqlî yê navçeya Şera hat vekirin. Dibistana Şehîd Fewzî, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dibistana yekemîn a bi zimanê kurdî bû. Li gorî hin daneyan 318 dibistan li bajarê Efrînê beriya dagirkirinê hatibûn vekirin. Nêzî 50 hezar xwendekarên seretayî, navîn û amadehiyê li wan dibistanan li ber destê 3 hezar û 712 mamosteyan perwerde didîtin. Yekemîn dibistan, peymangeh û zanîngeha bi zimanî kurdî li Efrînê hatin vekirin. 26ê tîrmehê 2015an, zanîngeha yekem hat vekirin. Ji bo gihandina mamosteyan di tevahî beşên xwendinê de, sala 2014an, li Efrînê Peymangeha Viyan Amara hat vekirin. 82 mamoste û bi dehan karmend çavdêriya peymangehê dikirin. Beriya ku dewleta tirk a dagirker bajarê Efrînê dagir bike, 500 xwendekar li peymangehê dixwendin. Ew bû destpêka pêvajoya perwerdeyê ya nû ku di tevahî qadên perwerdeyê de mamoste û kesên pispor werin gihandin.

Lê piştî ku Efrîn ji aliyê dewleta tirk û çeteyên wê ve hat dagirkirin, veguherî cihekî ku lê zimanê kurdî tê qedexekirin. Niha zarokên Efrînê ji zimanê xwe yê resen bêpar mane. Herwiha Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurd li Sûriyeyê biryara hikûmeta Sûriyeyê ya qedexekirina xwendina zimanê kurdî li Efrînê û deverên din ên rojavayê Kurdistanê şermezar kir.

Komîteyê tekez kir ku qedexekirina xwendina kurdî li Efrînê binpêkirina mafên çandî û neteweyî ye. Li aliyekî din jî şênî, mamoste û xwendekarên li herêma Efrîna rojavayê Kurdistanê dixwazin xwendina bi zimanê kurdî vegere dibistanan û mamosteyên kurdî vegerin ser karên xwe. Li gorî sazî û rêxistinên mirovî, mafê herkesî heye ku bi zimanê xwe yê resen perwerdeyê bibîne. Kurd bi salan in li her aliyên Kurdistanê têkoşînê ji bo zimanê kurdî didin û ji bo vê bi hezaran berdêl hatin dayîn. Lê em ji bîr nekin ku li aliyekî din ewqas zimanzanên kurd li ser xaka Kurdistanê xwe dikin qurbanê zimanê xwe û xebatên pîroz didin meşandin. Di nav vê rewşê de pêwîst e ku gelê kurd serxwebûn û yektiya xwe xurt bike, da ku zimanê xwe nasnameya xwe biparêze. Wekî ku pêşî û mezinên zimanê kurdî Celadet, Cîgerxwîn û bi dehan siyasetmadar û wêjevanên me gotine, serxwebûna Kurdistanê bi ziman pêkan e. Divê ev bang û daxwazên wan bi cih bên. Li hember vê rewşê û polîtîkeyên qirêj divê asta zimanê kurdî hîn bêhtir were bipêşxistin.



Prof. Dr.
Abdulîllah Polat

# Rûmet, pêdiviya bi welatekî ye

Welat bi hestekê dest pê dike. Ew bi dengekî nizm dibêje ku ez xwebûna xwe me, ez ewle û xuya me. Dema ku ev navika hundurîn ji ber tundûtûjiyê, tevî îstismara cinsî, diheje, jiyan ji kontrolê derdikeve. Şev dirêj dibin, wêneyên nasêş dibin û nêzîkbûn xeternak dibe. Hin kes vedikişin, hinên din jî bi awayekî otomatîk dixebitin. Bertekên wiha, wekî ku psîkiyatrîst Judith Herman diyar dike, hewldanên xweparastinê yên derûniya di bin gefê de ne û Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, di dabeşkirina xwe ya heyî de, pirsgirêkên xewê, dûrketin û zêde-stîmulasyonê wekî encamên tîpîk ên wendakirina kontrolê destnîşan dike.

Xwebaşkirin nayê wateya vegera bo rabirdûyê. Ew xebata nerm a ji nû ve dîtina rîtm û rêwerzê di dema niha de ye. Ew pir caran bi kêliyeke bêdeng a nefesgirtin û tevgerê dest pê dike, kêliyek ku laş êdî hîs nake, tê nêçîrkirin. Bessel van der Kolk û Stephen Porges nîşan didin ku hişmendiya laş, girêdana ewle û rêxistina teknîkên nefesgirtinê dikarin pergala bersiva stresê aram bikin. Nirxandinên lêkolîna hişmendiyê rapor dikin ku rêxistina bal û hestyarî çêtir kiriye, alîkariya kesên bandordar dike ku bigerin û çalakiyek domdar bikin. Naskirina tetikan, danîna sînoran, lêgerîna alîkariyê û bipêşxistina têkiliyên baweriyê aramiya hundurîn pêk tînin. Rîtuel piştgiriyek zêdetir peyda dikin, ji ber ku ew ezmûnan ava dikin, fikaran kêm dikin û girêdanan xurt dikin. Michael Norton û Francesca Gino di ceribandinên xwe de delîlên bandorên wiha dîtine û Laurence Kirmayer rave dike ka pratîkên civakî çawa wate û berdewamiyê diafirînin bêyî ku nakokiyan veşêrin.

Tiştên ku ji bo kesan rast in, ji bo civakan jî derbasdar in. Ev yek bi taybetî di ezmûna kurdan de aşkere ye. Li gorî texmînên heyî, li Tirkiye, Îran, Iraq, Sûriye û diyasporayê ji 30 heta 40 milyonî kurd hene. Dîroknasên mîna David McDowall û Michael Gunter curbicur şert û mercên herêmî û bûyerên dubare yên qedexe, sirgûn û tundûtûjiyê ronî dikin. Rêxistinên mafên mirovan ên mîna Amnesty International û Human Rights Watch (Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî û Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan) raporên mafên ziman ên sînorkirî, sînorkirinên siyasî û operasyonên ewlehiyê yên dijwar belge dikin. Di heman demê de, destpêşxeriyên (înîsyatîf) nû derdikevin holê. Ciwan û xwendekar qadên fêrbûnê diafirînin, li ser siyaset û felsefeyê nîqaş dikin, komeleyên çandî ava dikin, ziman û muzîkê bi pêş dixin û bi salan e Cejna Nevrozê li seranserê sînoran pîroz dikin. Lêkolînên civakî û çandî pratîkên wiha wekî çavkaniyên berxwedana çandî şîrove dikin. Michael Ungar û Laurence Kirmayer rave dikin ka çawa tor dikarin hesta aîdiyetê û çalakiya kolektîf xurt bikin, nemaze di demên ku koçberî, pevçûn û bêewlehiyê jiyana rojane tevlihev dikin.

Zilm û zordarî şopa xwe li jiyana rojanê dihêlin. Perwerde dijwartir dibe, beşdarbûn ne diyar dibe, tirsa ji dûrxistinê belav dibe û ezmûnên tundûtûjiyê bandorê li malbat û gundan dikin. Di heman demê de, faktorên parastinê zêde dibin. Komên jinan ên berpirsiyar, torên xwendekaran û hikûmetên herêmî cihên ku beşdarbûn gengaz e diafirînin. Sosyolojî teqez dike ku sermayeya civakî û çalakiya kolektîf dikarin ewlehî û hevkariyê bi pêş bixin. Robert Putnam hêza têkiliyên baweriyê vedibêje û Robert Sampson nîşan dide ka çawa hêviyên hevpar û baweriyê taxan stabîl dikin. Peggy Thoits nîşan dide ka çawa piştgiriya civakî û rolên naskirî tenduristiya derûnî xurt dikin. Şêwirmendî, perwerde, alîkariya hevbeş û biryargirtina hevbeş di nav pirên wiha re derbas dibin. Stevan Hobfoll û Fran Norris tekez dikin ku ewlehî, aramî, tevlîbûna civakî û agahdariya zelal piştgiriyê didin başbûnê piştî tundûtûjî û karesatan, nemaze dema ku xizmet bi kesên bandordar re tên bipêşxistin û bi rengekî hestyar a çandî tên bicihkirin.

Ji hêla siyasî ve, rewş nazik dimîne. Dewleta îslamî ya qaşo bi awayê leşkerî hatiye paşvekişandin, hîn jî li ser herêmên kurdî di bin gef û zexta wê de ne. Tevî xweseriya li başûrê Kurdistanê, aloziyên aborî û siyasî berdewam dikin. Herwiha gef, êriş û reqabetên navneteweyî bandoreke mezin li ser jiyana rojane ya li bakurê Sûriyeyê dikin. Gelek kurdên li Tirkiye û Îranê ji zilm û qedexeyan gazinan dikin. Raporên Neteweyên Yekbûyî û herwiha Amnesty International û Human Rights Watch, balê dikişînin ser xetereyên dubarebûyî ku li gorî cih û deman diguherin. Bêewlehiya dirêj zirarê dide tenduristiyê û hesta ewlehiyê. Michael Marmot û Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê nîşan didin ka çawa derfetên newekhev û stresa kronîk laş û hişê mirovan dihejînin û temenê jiyanê kurt dikin.

Rêyeke domdar a pêşveçûnê dikare bi sê têgehan de were kurtkirin. Rastî tê wateya dîtina rastiyê û navdayîna zirarê bêyî zêdegavî û bê zêdegaviyê. Priscilla Hayner nîşan dide ku qebûlkirin û çareserkirina êşê bi awayekî zelal baweriyê xurt dike dema ku ew bi awayekî herêmî kokên wê hebin û tê de bin. Rûmet tê wateya parastina tiştên ku mirovan diparêzin (ziman, çand, nav û bîranîn) bi hevberkirina wê bi naskirina qanûnî û tezmînata dadperwer. Tom Tyler û Steven Blader nîşan didin ku muameleya bi rêz û prosedurên dadperwer rewatiya saziyan xurt dikin û amadebûna qebûlkirina qaîdeyên hevpar zêde dikin. Li dawiyê, avahî tê wateya cîhên gihîştî û qaîdeyên pêbawer ku jiyana rojane ewletir dikin. Ev navendên şêwirmendiyê, dibistan, klûb, rêxistinên civakî û cihên civînê yên ewle zarok, ciwan û mezinan vedihewînin. Lêkolînên li ser civak û karesatan nîşan didin ku têkiliya ewlehî, aramî, tê de bûn û agahdariya zelal şîfa û beşdarbûnê gengaz dikin.

Ji ber vê yekê, wateya welat ji erdê xwerû yê li bin lingên me pir berfireh û zêdetir e. Ew nefesek aram, peyvek parastinê ye, destek girtinê ye. Dema ku pencere dîsa vedibin, hewaya sar dikeve hundir, carinan bîranînên tûj û dîsa jî dengên ku me diparêzin jî vedigerin. Tişta ku tê bihîstin dikare bidome. Yên diparêzin şekil didin pêşerojê. Aştiyeke hundirîn ji tevgerên piçûk û bawerpêkirî derdikeve holê û di wê aştiyê de, ciwanî derdikeve holê. Lêkolînên berxwedanê, di nav de yên George Bonanno û Ann Masten, tînin bîra xwe ku her çend rê kêm caran nerm be û piştgiriyê hewce bike jî, gelek kes tevî zehmetiyên girîng aramiya nû dibînin. Mirov û çîrokên wan nikarin werin kêmkirin bo birînên wan. Li cihê ku rastî tonê destnîşan dike, rûmet li ser hêzê serdest dibe û edalet li ser rehetiyê serdest dibe û lêkolîna hundirîn dest pê dike. Ji vê yekê, aştiyeke mayinde derdikeve holê. Ji bo kesên bandordar, ji bo civakan û ji bo kurdan, dîrok nîşan dide ku mirov dikarin ji şer û bêdengiyê bihêztir bin.

# Gama çareserîye

**Têgêrayîşê Azadî yê Kurdîstanî 26ê teşrîna verêne de eşkera kerd ke tayê komê gerîlayan Bakûrê Kurdîstanî ra anjînê. Na gama tarîxî de îradeyê çareserîye û aştîye est o**

| Merkezê Xeberan



Mîyanê yew serre de Kurdîstan, Tirkîya û Rojhelatê Mîyanênî de xeylêk çîyî bedilîyayî. Rewşa Sûrîye Tirkîya ser o zî tesîr viraşt û hukmatê Erdoganî planê xo bedilna. Na çarçewa de Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî reyde pêvînayîşan dest pêkerd. Dewlete fam kerd ke şaro kurd Rojhelatê Mîyanênî de dînamîko dîyarker û tesîrdar o. Polîtîkaya şerî ra fek vera da, dest pê polîtîkaya “detente” kerd. Bêguman peyê na polîtîka de vera hîrabîyayîşê Îsraîlî armancê hêzdarbîyayîşî zî est o. Êdî eşkera bî ke mîyanê Tirkîya û Îsraîlî de Rojhelatê Mîyanênî de şerê hegemonya est o. Tirkîya nêwazena ke Îsraîl kurdan reyde îtîfaq bikero û serdestîya xo bizedno.

Rayber Abdullah Ocalan sey muzakerevano serekeyî tewrê pêvînayîşan bî. Xora ey hertim çareserîya demokratîke pawitêne. Yanî waştêne ke persa kurdan û demokratîkbîyayîş bi rayîrê dîyalogî bêrê çareserkerdene. Nê konteksî de mesuldarîyêka pîle girewte xo ser û 27ê sibate de veng da PKK’yî. Na roje ra pey prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî dest pêkerd. PKK’yî peştî daye vengdayîşê Rayber Ocalanî û 1ê adare de adirbest îlan kerd. Çend mengan ra dima 5-7ê gulane de Kongreya xo ya 12. kerde û xo fesh kerd. Na kongre ra dima PKK’yî gamêka tarîxî ya bîne eşte, 11ê temmuze de gerîlayan çekê xo vêşnayî. Yew armanc est bî, o zî prosesê Aştîye û Komelê Demokratîkî rê hetkarî kerdiş bî.

**Awankerdişê cuya hempare**

Vera gamanê PKK’yî dewleta tirke binê serbanê parlamentoyî de “Komîsyonê Paştîdayîşê Neteweyî, Wayûbirayîye û Demokrasî” awan kerd. Estîya komîsyonî muhîm a, la karê xo qîm nêkeno. Heta nika 16 kombîyayîşî virazîyayî, hewce nêkerdêne ke hende kombîyayîşî bibê. Ganî komîsyonî zaf lez pêşnîyazê qanûnî bikerdêne. Çiqas ke komîsyon karê xo xejilneno, hende bawerîya komelî fînena. Serekê Komîsyonî Numan Kurtulmuşî vatêne ke wa PKK gamanê şênberanê bînan bierzo, ê derbasê serûberkerdişanê qanûnîyan bibê. Netîce de Têgêrayîşê Azadî yê Kurdîstanî 26ê teşrîna verêne de gamêka tarîxî ya bîne eşte û eşkera kerd ke tayê komê gerîlayan Bakûrê Kurdîstanî ra anjîyayî. Na eşkerayîye de ma çimdarîye kenê ke reyna îradeyê çareserîye est o. Têgêrayîşê Azadî yê Kurdîstanî wazeno ke persê seserre êdî bêrê çareserkerdene, cuya hempare, azade û têduşte bêro awankerdene. Ganî komîsyon yan dewlete nê îradeyî bivîno û gamanê şênberan bierzo. Xora eşkerayîye de ame vatene ke wa qanûnê azadîye û entegrasyonê demokratîkî bêrê viraştene. Yanî seba PKK’yî huqûqo demdemî hewce keno. Yewna zî qanûnê sey Qanûnê Têkoşînê Vera Terorî, Qanûnê Muhakemekerdişê Ceza ganî wedarîyê yan zî bibedilîyê.

**Wezîfeyê dewlete**

Heta nika dewleta tirke çekî û estîya gerîlayan sey bahane şuxilnayêne û game nêeştêne. Êdî vere dewlete de çi “astengîye” zî nêmende. Wa hukmatê Erdoganî êdî kesî nêxapino û wezîfeyê xo bîyaro ca. Komel verî hemwelatîya têduşte wazeno. Yanî heme şar û bawerîyî wazenê ke warê pêroyî de bêrê temsîlkerdene. Na çarçewa de demokrasîyo rasterast hewce keno. Êdî demokrasîyo temsîlkar probleman çareser nêkeno. Ganî heme pergalo sîyasî newe ra bêro awankerdene. Ganî qanûno bingeyî yo newî bêro viraştene, huqûq xoser bibo û hukm serdest bibo.







## Oxfam: Dewlemendî îklîmî çin kenê

Dezgehê hetkarîya merdiman Oxfam veng dano ke wa vera tewr merdimanê dewlemendan bacê rêça linga karbonî bêro caardene.

Neteweyê Yewbîyayeyî do aşma teşrîna peyêne de şaristanê Belemî yê Brezîlya de Konferansê Îklîmî yê COP30yî serûber bikerê. Dezgehê hetkarîya merdiman Oxfamî konferansî verî yew rapor amade kerd. Nê raporî de merdimê tewr dewlemendî yê dinya derheqê şuxilnayîşê nemutenasibî yê rêça linga karbonî de îqaz kerdî û veng da ke wa vera na grûbe baco taybet bêro caardene.

***Talanê îklîmî***

Goreyê analîzê newî yê Oxfamî yo “Talanê Îklîmî: Kêmîyêka Qije Dinya Kaş Kena Mîyanê Alozîye”, sera 0,1yê merdimanê tewr dewlemendan ê dinya $CO_2$ yo ke sera 50î yê merdimanê tewr xizanan ê dinya yew serre de ver bi atmosferî veradano, yew roje de veradano.

Beşê Belçîka yê Oxfamî eşkera kerd ke “Belçîka de merdimo ke aîdê sera 0,1ê merdimanê tewr dewlemendan o, têna mîyanê 17 rojan de, karbono ke sera 50î yê merdimanê tewr xizanan yew serre de ber ano, veradano”.

**Mesuldarê krîzê îklîmî**

Oxfamî ard ziwan ke merdimê ultra dewlemendî têna bi formê cuya xo nê, eynî dem bi sermayegozarîya ke sektoranê sey sotemenîya fosîlî, neft û madenkarîye de kenê, mesuldarê krîzê îklîmî yê.

Rapor de ame îfade kerdene ke peynîya 2024î de şaristanê Baku yê Azerbaycanî de kombîyayîşê îklîmî COP29 de fekafek 1.800 lobîstê sotemenîya fosîlî tewr bîyî û na rewşe muzakereyanê mîyanneteweyîyan ser o tesîrêko xirab viraşto.

***Krîzê nêtêduştîye***

Dîrektorê Pêroyî yê Oxfam Internationalî Amîtabh Beharî no ercnayîş kerd: “Krîzê îklîmî eslê xo de krîzê nêtêduştî yo. Merdimê tewr dewlemendî rijîyayîşê îklîmî finanse kenê û nê ra qezenç kenê; eksê nê zafêrîya dinya raştê netîceyanê xiraban yena”.

***Talebê Oxfamî***

*Oxfamî hukmatan rê nê vengdayîşî kerdî:*

✓ Merdimanê tewr dewlemendan û tewr gemarin kerdoxan ra bac bigêrê,

✓ Karanê hedravîyarteyan ê şîrketanê sotemenîya fosîlî ra bac bigêrê,

✓ Peymana hemkarîya bacî ya mîyanneteweyî ya Neteweyanê Yewbîyayeyan rê paştî bidê,


✓ Beşdarbîyayîşê şîrketanê sotemenîya fosîlî yê muzakereyanê îklîmî qedexe bikerê,

✓ Vengê komelê sîvîlî û şaranê cayîyan hêzdar bikerê,

✓ Parekerdişê butçeya karbonî peyda bikerê,

Goreyê Oxfamî, edaletê îklîmî têna peynîardişê heqê karbonî yê merdimanê dewlemendan ê îmtîyazdarî reyde mumkun beno.





Ehmedê Bira

# Komara demokratîke

Birêz Ocalanî dewrêko newe, rupelêko saye, ya amayîşê kurdan û tirkan rê akerdo. Nê dewrî de rayberdê TC’yî, eke zey Ocalanî têbigeyrê, dewrî de do berê bîyayîşî abo, eke tênêgeyrê, do berê çînêbîyayîşê Tirkîya abo. No zî bi her hawayî zirarê ma hemeyan o. TC gere gamanê şênberan berzo, çimkî zalimîy wazenêy ke tola xo wedarnêy.

Kurdan weş fam kerdo ke bi her hawayî kurdîy do qezenç bikerêy. Kurdîy wazenê tirkî zî qezenç bikerêy.

Sere de Ocalan wazeno ke kurd û tirk pîya qezenç bikerêy; şansêko newe û rayîrêko demokratîk bê xapênayîş bi edalet û bi heş, mojnayo rayberdanêy TC’yî. Nê semedî ra TC mecbûro ke berê bîyayîşî akero ra û gaman bierzo.

**Fîlozofê seserre**

Belê, ma hemeyî zanêy ke Birêz Ocalan bi her hawayî vervînoxêko pîl o. Goreyê mi Ocalan fîlozofê na seserre yo. Amayîşê kurdan û tirkan tenê nê, amayîşê heme şaranê dinya ser û weşeya fezayî ser de mijûl bîyo, hewna zî beno û do bibo zî. Nê semedî ra, lazim o TCyijîy kurdan ra veşî weşeya Ocalanî biwazêy û fîkrê ey ra warêteyî bikerêy. Mi ra vatiş, eke nêkerêy do tirkîy zaf çîyan vinî bikerêy.

**Rêza game eştişî**

PKK’yî bi vengdayîşê Ocalanî gamê şênberî eştî. La heta nê demî TC’yî gamêke nêeşte û heme çî raybereŷî ser o de dayê vindarnayene. Gelo, hewna binmezgê TCyijan de xapênayîşê kurdan est o? Beno ke bibo. La dilê min wazeno ke hinî nêbo. Çimkî kurdan qet nêwaşto TC perçe bibo. Polîtîkay diryaye û çirya yeyê ke, bi destêy tirkan ameyê meydan û ardêy Tirkîya ser wazenê TCyî perçe bikerêy. Kurdan heta nêy gamî diryayê û çiryayeyê TCyijan deşto. 28 serewedarnayîşê kurdan heme semedê wedarnayîşê bêedaleteyî bîy. Herî peynî de zî Ocalan verê bêedaleteyî vinderto û na game rayîrêk mojnayo. Lazimo şarê TC’yî heme goş biderêy vengê ey.

**Rewşa Tirkîya**

Çimkî ewro TC kerdêy halê merdişî ver, bêedaletî ra destpêkerdo heta veyşanverdayîşê şaran û kurdan, no zî bes nîyo, torpîl û rotişê TCyî ra bigêy heta polîtîkaya şaş ya citkarey û heme polîtîkayan verde, sifte kurdîy vindertêy. Ma kurdan waşto ke heqê şaran bidêy û ma bi nuşteyê xo, bi xebata xo û bi çalakîya xo birîna TCyî derman bikerê ra xebitnayo û pîne kerdo û kenêy.

**Netîceya TC’yî**

Kurdîy zanê ke TC xirabe bo do sifte zirarê herî pîlî şaro kurd û welatijêy bindestî yê TC’yî do bivînêy. Ango na welatijêy TC’yî heme zey filîstînijan do muhtacê nanêkî bibêy. Muhtacê heme çîyanê serekeyîyan bibêy. Ez hîna vana belkî tikeyê şima vano do hinî nêbo! Wa tu kes vîra nêkero ke, çimê zalimanê dinya hemeyan Kurdîstan û Anatolîya ser o de yo ke nêy cayan goreya xo talan û wêran bikerê. Ma reyna vîra mekerêy ke eke TC heşê xo meyaro sereyê xo û gamanê şênberan nêerzo, TC û Kurdîstan de 50 serrêy ma ver de zî do bi şer û pêrodayîşan ravêro. Belkî TC çînêbo! Belkî Kurdîstan awa bo! No bedilîyayîş do bi destê zaliman bibo û do gunîya ma bişimê, ma vera jûbînan bidê ke, ma amayîş de bi her hawayî nêeşkê serê xo weraznê...

**Ewropayijî û kurdî**

Lazimo şaro kurd Seleheddînê Eyûbî çi çî ardo serê ewropayijan vîra nêkero. Bi saya kurdan Seferê Xaçlîyan berteraf bîyî. Ango ma kurdan kalikê înan kişto. Gelo ma kurdîy weş zanêy ke kam ke merdimê ma bikişo, o kes dişmenê ma yo. Nê semedî ra zî, ewropayij û dostê înan, ma kurdan zey dişmenê xo vînenêy. Her çiqas nîyarê ziwan zî binmezgê înan de no gurîyeno. Ewro zî polîtîkaya înan ser o pere qezençkerdiş o. Eke firsend bivînê, do kurdan bi heskêkê awe de bixeniknêy.

Jawad Morad



# Tiştanok

Gelî hêjayan; mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

**1-**
Cêwîne li kêlek in
Ne goşt in, lê nermik in
Dengan kom dikin
Ew çi ye?

**2-**
Tiştekî min heye tiştanok,
destarok, hilpeserok
Dema dimeşe diheje
Di nava goşt de pir xweş e
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

**1-** Guh **2-** Dûvê pez

# Xwezî min nepirsiya!

**Hesen Hemkê**

Şerîfo, rojek tenê jî sebra wî bê teşqele nedihat. Serê sibehê gelekî bela xwe di Şerîfayê da lê dilê wî hênik nebû.

Şerîfo derket nav taxê û li dawiya kolana wan pîra Nofa li devê derî rûniştî bû.

Şerîfo xwest bela xwe di pîrê bide û jê re got, 'Pîrê ez tî me bi xêra xwe tasek av bide min.'

Pîrê bi alîkariya gopalê xwe rabû tasek av ji Şerîfo re anî.

Şerîfo av vexwar û paşê tasa pîrê avêt erdê û pêl tasê kir, tas pelixand.

Pîrê jê re got, 'Xwedê emrê te kinkiro, te çima tasa min pelixand, ka îcar wê kalo bi şev di çi de mîz bike.'


Şerîfo got, 'Xwezî ne min tasa te bi-pelixanda, ne jî naskiriba ku te bi tasa mîza kalo av daye min.'



# XAÇEPIRS

## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE


**3-** No **5-** Jan **7-** Fêkiyekî zivistanê **8-** Hewa **9-** Tîna agir **13-** Navekî jinan yê kevnar **14-** Bere **16-** Derew **19-** Şidet **20-** Rojeke hefteyê **21-** Rewşa çavê jinan **22-** Alaveke nanpijandinê **25-** Noteyeke muzîkê **26-** Bi tena xwe, bi serê xwe **28-** Kesên ku zarok di dawa wan te tên sinetkirin



## JI JOR BER BI JÊR VE

**1-** Jineke sembola têkoşîna gelê kurd
**2-** Qencê Xwedê
**3-** Fêkiyeke havînê
**4-** Sembola dayikbûn û jiyanê
**6-** Navê jinekê ku di berxwedana Kobanê de bû sembol
**10-** Îrade
**11-** Ne temam,
**12-** Ne hişk
**15-** Bawerî
**17-** Kurtkirina navekî jinan
**18-** Genimê ku simbil daye û hîna hişk nebûye
**20-** Rikbirî, serhişkî
**23-**Tevger
**24-** Televizyoneke pêşeng a kurdan
**27-** Kar û xebat

## Bersiva hefteya borî





Fatma Taşli Tunç

# Ristemê min lawooo!

Li Çinara Amedê gundê Kabiyê, malbata xalê Sîno dijiya. Xalê Sîno û hevjîna xwe û du keç û kurek xwe, malbatek ortehal, ne xizan û ne jî dewlemend bûn.

Xalê Sîno şivanî û kurê wî gavanî dikir. Keça wî û dayika xwe jî karê erdan dikirin; tevrik, pembo, pîvaz, îsot, bacan... hema çi têketa ber wan dikirin.

Dem derbas bû, zarok mezin bûn hatin zewacê.

Keça xalê Sîno Zuleyxa keçek xweşik û delal bû.

Mala wan li taxa jorîn bû, rêya kaniyê di ber mala wan re diçû.

Rojekê hinek nasên wan, keça wan dibînin û dinêrin pir xanim e. Ew dibêjin em ê herin hev nas bikin û ku qismet be em ê dewa merivatiyê li wan bikin.

Werhasilê kelam, herdu malbat hev agahdar dikin û dest bi amadekariyên xwe dikin ji bo malovanî û mazûvaniyê.

Dayik ji keça xwe re dibêje:

-Zuleyxa, keça min, wê îro mêvanên me werin ji bo dîtina te, ku hûn herdu jî razîbin em ê ji were hêlînekê çêbikin. Hey gidî dinyayê, êdî wexta fira te ya ji hêlînê hatiye, keça min, tê ji hêlînê bifirî û herî ji xwe re hêlînekê çêbikî. Hîn duh jî tu zaroka ber şîr bûyî. Wext dilezîne keça min. Em êdî nagihîjinê.

Dema ku dayik diaxife Zuleyxa bi baldarî li dayika xwe gudarî dike û difikire.

-Hêlîn? Ez ê ji hêlînekê bifirim û hêlîneke çêbikim? Ma ez çûk im, an werdeka bejî me, na na hechecîk im, na lê ez legleg im!


Zuleyxa dibêje pirq û dikene.

Dayika wê dibêje:,

-De rabe bes xwe qeşmer bike, tu dizanî ez behsa çi dikim. Zû rabe here ji kaniyê cêrek ava sar bîne beriya ku mêvan werin.

Zuleyxa radihêje cêrê avê û berê xwe dide ser kaniyê. Cêrê xwe tije av dike û li vegerê, li ber cihoka avrêja kaniyê kulîlkekê dibîne û cêrê xwe ji ser milê xwe datîne û pêçîkên xwe yên zirav û gewr li ser kulîlkekê digerîne û dikeve nav xewn û xeyalan.

-Wê îro xwazginiyên min werin, ez û destgirtiyê xwe em ê pir jî hev hez bikin. Em ê evîndarê hev bin û wekî ku dayika min dibêje, em ê ji xwe re hêlînekê çêbikin û em ê bi kêfxweşî di hêlîna xwe de bigevizin. Wê zarokek min çêbibe ez ê navê wî bikim Ristem û wê Ristemê min pir delalî be. Em ê wî ji her tiştî biparêzin û ez ê rojekê werim mala bavê xwe û wê dayika min bêje min, keça min, ka here ji kaniyê cêrek ava sar bîne û ez ê rahêjim cêr û werim ser kaniyê û wê Ristem jî li pey min were û wê vê kulîlkê bibîne û destê xwe bavêjê û di ve cihoka avê de werbe û xwedê neke ku ez nebînim wê bifetise.



Zuleyxa li ber kaniyê destê wê li ser kulîlkekê û destê din bi çembilê cêr ve, di xew re çûye. Dayika wê dibîne ku saetek derbas dibe lê Zuleyxa tune ye! Ew bi meraq radibe û berê xwe dide ser kaniyê, dinêre ku Zuleyxa li ber kaniyê di xew re çûye.

-Zuleyxa, Zuleyxa rabe keça min, çi bû ji te?

Zuleyxa çavên xwe vedike û digirî. Cêr datîne û xwe davêje hembêza dayika xwe.

-Hahoooo yadê! Ristem di avê de werbû. Ez ê çi xweliyê li serê xwe bikim.

Dayika wê jî qet nabêje Ristem kî ye. Ew jî digirî û dibêje 'Hahooo! Ristemê min'.

Û kî tê bi ser wan de digirî û dibêjin, 'Ha-hoooooo Ristem lawooo!'.

# Koçberiya fîlmên karton ên biyanî û kurdî

Zarokên kurdan demeke dirêj neçar mane ku fîlmên karton ên biyanî li ser kanalên pergalê temaşe bikin. Lê li hember vê pişaftin û qirkirinê, "Zarok TV" bi kurdî dest bi weşanê kir û ji van gavan re got "bes!". Zarokên kurdan ji vê kanalê pir hez kirin

Metîn Dag



Bi navê xwe yê cîhanî "anîmasyon", lê bi navê me "fîlmên karton ên biyanî", yek ji şaxên herî girîng ên hunera sînemaya dirêj e. Di dîrokê de yekemîn fîlmê karton ê biyanî, sala 1908an, ji aliyê "Émile Cohl" ve, bi bikaranîna anîmasyona bi dest kişandî, hat çêkirin. Ev bû gava yekemîn a ku ev pîşesazî heta îro bê rawestan berdewam bike. DYA, mîna her qadên jiyanê, di vê qadê de jî bi awayekî serdest ket nav kar û bû welatê ku ev dîmen herî zêde li cîhanê belav kirin. Pîşesaziya fîlmên karton ên biyanî li DYA bû pîşesaziyeke mezin. Bi vê wateyê, şîrketa herî mezin "Walt Disney" ye û karakterê bi navê "Mickey Mouse", ku bi cîhanê dan nasîn, bûye karakterê herî naskirî. Ev karakter ji aliyê DYAyê ve li gelek welatan hat belavkirin. Di salên pêş de DYA, bi çîrokên xwe re lehengên qerfok adapteyî çîrokên biyanî kirin û ev leheng xistin xizmeta fîlmên karton ên biyanî li cîhanê. Carinan propagandaya tundrew, carinan jî pesnê DYAyê didin; bilind dikin û hesteke veşarî ya heyraniyê bi pêş dixin; mînakên wekî "Superman", "Spider-Man", "Captain America" û gelek lehengên bi vî rengî bi cîhanê dan nasîn.

**Hayao Miyazakî**

Sînemaya ruhdayînê yek ji hêmanên dîmenî yên herî girîng e ku çîrok û çandên berê digihîne roja me ya îroj. "Hayao Miyazaki", derhênerê japonî yê ku serdestiya fîlmên karton ên biyanî yên amerîkî têk bir û ji vê hunerê re deriyekî cuda vekir, bû navê herî girîng ê xwedî cîhaneke xeyalî ya fireh ku bikeve nav rûpelên dîroka sînemaya cîhanê. Ev derhênerê ku şêwaza xêzkirina anîmasyonê li cîhanê da nasîn û hezkirin, di fîlmên xwe de çanda japonî bi anîmasyonê bi cîhanê dide nasîn û di heman demê de, peyamên gerdûnî dide. Li Japonyayê nifş bi çanda van fîlman mezin dibin, nêrînên wan ên jiyanê dibe mînak û derdikeve holê.

**The Sîmpsons û Amerîka**

Fîlmê karton ên biyanî "The Simpsons", ku "Matt Groening" afirandiye, sala 1989an, li DYAê û paşê li hemû cîhanê hat weşandin û gihîşt qadeke gelek berfireh. Taybetmendiya herî mezin a vê çîrokê ew e ku bûyerên pêşerojê berî dema qewimandinê derbasî senaryoyê dike û piraniya wan pêk tên. Nivîskarên xêzefîlmê ji yekîneya bernameya radyoyê ya "Newsbeat" a BBCyê re axivîn û gotin ku ev yek, li dijî texmîna gelek kesan, bi teoriyên komploger ve nayê girêdan; ji ber ku di xêzefîlmê de li ser gelek mijaran texmînên pêşerojê tên kirin û îhtîmala pêkhatina wan zêde dike. Lê ev ravekirin rê li ber pirsên ka senaryoyên di xêzefîlmê de ji aliyê kîjan kesan ve tên nivîsandin venake.

**Şînok û komunîzm**

Medyaya dîmenî qadeke pir girîng e ku digihîje qadeke mezin û di vê qadê de bazara fîlmên karton ên biyanî mezin dike. Li vê qadê armanc zarok in, rasterast peyam nade, lê bi rêya peyamên veşarî ku tên dayîn, di binhişê mirovan de rûdinê. Mînaka herî mezin a vê yekê fîlmê karton ên biyanî "Şînok" e. "Şînok", ku ji aliyê xêzkarê belçîkî "Pierre Culliford" (bi navê "Peyo") ve hatiye afirandin, sala 1981an, li gelek welatan hat belavkirin û weşandin. Di salên derbasbûyî de bi hinceta propagandaya komunîzmê li gelek welatan hat qedexekirin. Sedema van qedexeyan yek ji wan ev e: Rêberê Şînokan "Bav Şînok" bi kumê xwe yê sor ku dişibiya "Karl Marx", li gundê Şînokan jiyaneke komînal qebûl dike û her kes bi xwezayî karê xwe bi rê ve dibe. Li gundê Şînokan cihên îbadetê yan pîroz tune ne. Li gund pere tune ye, hemû milk milkê gund û gundiyan e. Kesê bixwaze bi awayê xwe bi rê ve bibe dikare bi kar bîne û bi rê ve bibe. Şînoka kêrnehatî jî bi jiyana xwe ya xweser ve wekî Şînokên din dijî. Pisîkê "Gargamel" (Azman) jî dewleta kapîtalîst a mezin temsîl dike. Ev hemû tesaduf in an bi zanebûn in? Fîlmê karton ê "Şînok" em careke din temaşe bikin û biryarê bidin.

**Kurd û fîlmên karton ên biyanî**

Kurd- an jî bi rastî zarokên kurdan - demeke dirêj neçar mane ku fîlmên karton ên biyanî li ser ekranên kanalên pergalê temaşe bikin, lê tiştekî aîdî xwe tê de nabînin. Polîtîkaya fermî ya înkarê ku dewlet di fîlmên karton ên biyanî de derbas dibe, bi awayekî cuda û tund bi zimanê tirkî berdewam dike. Li hember vê paşaftin û qirkirinê, "Zarok TV" ku bi kurmancî, soranî û zazakî, 21ê adara 2015an, dest bi weşanê kir û ji van gavan re got "bes!". Zarokên kurdan ji vê kanalê pir hez kirin. 29ê îlona 2016an, bi hinceta darbeya 15ê tîrmehê hat rawestandin; bi Zarok TVyê re 12 kanalên televîzyonê û 11 kanalên radyoyê hatin girtin. Paşê qedexeya li ser Zarok TVyê hat rakirin. Lê zagonên qedexekar û bêderfetî her tim li ber Zarok TV dibin asteng. Dîroka kurdan û têkoşîna berxwedanê ewqas dewlemend e ku dikare bibe îlham ji sedhezaran senaryoyên fîlmên kartonî re. Bi vê wateyê, qada herî mezin a ku em ji nifşên pêşerojê re bihêlin an jî ji zarokên xwe re vebêjin, bêguman bi qasî fîlmên karton ên xwemalî jî divê. Ji holê rakirina valahiyên li vê qadê divê bibe yek ji prensîbên pêşeroja me û hemû zarokên me.

# Li wêjeyê 'Çîrokên li ber bayê' zêde bû

Servîsa Çandê

Salane li wêjeya kurdî berhemên nû zêde dibin. Sala 2025an, gelek pirûkên kurdî hatin çapkirin. Yek ji wan jî "Çîrokên li ber bayê" ye. Ev pirtûk ji aliyê nivîskar Evdirehman Elçek ve hatiye nivîsîn ji aliyê Weşanxaneya Nûbiharê ve hatiye çapkirin.


Pirtûk ji cureya çîrokan e. Ev jî dide xuyakirin ku di wêjeya kurdî de cihê kurteçîrokê her diçe geştir dibe. Nivîskar Evdirehman Elçek jî di vê berhemê de vebêjiya xwe ya di kurteçîrokê de berdewam dike.


Metneke wêjeyî bi rêya vebêjer dengê xwe diafirîne, lê dengê her xwendinê aîdê xwîner e. Di çîrokên nivîskar Evdirehman Elçek de dengekî tazî û ragirtî di derûna karakteran de rengê xwe dide xwîner. Di berhemê de zeman û mekan ber bi rabihuriyê ne.

Nivîskar Evdirehman Elçek şêwazên cihê di vegotinê de dane xebitandin; car heye deqên kurt û parçeyên tematîk şewqa xwe didin ser mijarê; car jî heye ku çîrok di teqla nezmê de daye herikandin.

Helbet nivîskar Elçek piranî li pey mijarê ye ku kêş û vekêşa derûna vebêjer, meriv ji jiyana şexsî û rojane didin der. Çîroka bi navê Celse ku bi beşên celseyên mehkemeyê diherike, hest û bêhûdeyiya wê hewaya Doza Kafka jî dide.

Mekanê hin çîrokan wekî nexweşxane, xaniyên xalî, kesên tenê, tirs û xeyalên wan wê atmosfera metnê ava dikin.



Rohat Bulut

## Çand kurdî li destpêka şaristaniyê!

Pêwîst e em bi hewldanek mutewazî û dilnizm nêzî çand û dîrokê bibin. Bi hestî û ji agahiyên zanistî bêpar tespîta rast bi pêş nakeve û dîrok nayê şîrovekirin. Her agahî û dane pêwîst e xwe bigihîne encama xebateke zanistî û di serada mantiqa mirov a zanîn û serwextiya dîrokî re derbas bibe. Nêzîkatiyek dîrokî ya diyalektîk a rast dê bihêle ku em bigihîjin nirxandinên herî rast, heta bi çavdêriyên sînorkirî yên diyardeyê jî. Heke ne wisa be zehmet e mirov fêhm bike û bigihîje encameke rast. Ji lewra jî bi vê perspektîfê, bêhempabûna diyardeya kurdî di rêça pêşketina giştî de dê çêtir bê fêmkirin.

Dema em berê xwe didinê, civak heta serdema neolîtîkê dişibin hev. Serdestî pir zêde xuya nake yan jî ew serdestî bandorê li civakên din nake. Dema em dibêjin civak em tenê behsa gelê kurd nakin. Heke her tiştî bînin bi gelê kurd ve bizeliqînin dê ev bibe nêrîneke hestî û nijadî ku ew jî tê wateya ji rastiyê dûr.

Em behsa civakên mirovan ên ku hêj çand û zimanê wan bi xweşikî diyar nebûne yan jî ew ferqa etnîkî bi wan re bi pêş neketiye dikin. Li gorî dane û xebatên lêkolînî yên dîrokî, tê zanîn ku civakên wê serdemê bi nêçîr û berhevkirinê jiyana xwe didomînin. Ew civakên ku em behs dikin wekî yên niha herjmara wan ne bi milyonan e. Ew civak ji komên ku ji sedan kesî zêdetir nebûn ku bi nêçîrvanî û berhevkariyê debara xwe dikirin. Di wê serdema neolîtîkê de pêşveçûneke sînorkirî ya çand û ziman hebû û bi xwe re cûdabûnê jî diafirîne. Yanî rêya li ber pêşketina çand û zimanê civakî vekiriye. Di vê qonaxê de, serweriya civakekê li ser ya din ne gengaz e.

Ya rast dema em li ser rûpelên di warê dîrokê de lêkolîn û xebat hatine kirin dinêrin, em dibînin ku bi neolîtîkê re hin tişt şênbertir dibin. Ango mirov dikare bêje ku civaka neolîtîkê bi destpêka dîrokê re hevdem e. Yanî êdî daneyên dîrokî yên civakî û mirovî ji wê serdemê pê ve zelaltir dibin. Rista civaka ku neolîtîk afirandiye di destpêkirina dîrokê de aşkera ye. Hemû analîzên arkeolojîk û etîmolojîk gumanê nahêlin ku ev civak li herêma ku kurd hêj jî lê dijîn hatiye afirandin. Ji ber vê yekê, çavdêriyek girîng a derbarê diyardeya kurd de ev e ku ew ji pêkhateyên civakî yên herî kevin in ku di neolîtîkê de bi pêş ketine û jiyane. Ev çavdêrî pir girîng e.

Lê dixwazim li vê derê rê li nîqaş û lêkolîneke din jî vekim. Rêber Ocalan di perspektîfa xwe ya dawî de balkişandibû ser Girê Mirazan ku wekî ev der ji aliyê "Kastîk Katîl" ve hatiye avakirin û ew hêza "Kastîk Katîl" ji bo civak neçarî niştecihbûnekê kiribin. Ango li gorî vê tezê mirov fêh dike ku neolîtîk encama pergeleke zordestî ya hêzên wê demê ye. Her wiha em ji xebatên lêkolînî yên arkeolojîk, antropolşîk û etîmolojîk hîn dibin ku civaka ku neolotîk bi pêş xistiye civaka Aryen e.

Di hemen demê de me ev serdem wekî "Şoreşa Gund û Çandî" pênase dikir. Belê di rastiya xwe de di warê çand, ziman û civakî bûyînê de serdemeke girîng e. Lê ev jî hêjayî nîqaş û lêkolînê ye; heke ew hêza "Kastîk Katîl" ku Girê Mirazan afrirandibe û serdema neolîtîkê jî berhemeke wan be wê demê civaka kurd a ku ji wê serdema neolîtîkê re pêşengî kiriye çawa pênase bikin; civakeke azad yan jî ya koledar?

xwebûn
3 - 9 Mijdar 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 307

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Tenduristiya derûnî û edaleta civakî

Edaleta civakî, bi wateya xwe ya herî giştî, têkiliyên navbera civak û takekesan saz dike û armanc dike ku çavkanî, maf û derfetên di nav civakê de bi awayekî adilane li her takekesî bên belavkirin. Dema di vê belavkirinê de newekhevî çêdibin edaleta civakî pêk nayê



Siyabend Aslan

Tenduristiya derûnî, diyardeyeke aloz û piralî ye ku nikare tenê weke mijareke takekesî bê nirxandin. Rewşên civakî, faktorên bingehîn in ku rasterast şêwe didin rewşa derûnî ya takekesan û divê tenduristiya derûnî weke mafekî bingehîn ê mirovî bê qebûlkirin. Newekheviyên aborî, cudakerî, bêhiqûqî û bêedaletiya civakî rasterast bandorê li rewşa derûnî ya takekesan dike û pirsgirêkên wan ên derûnî yên heyî dijwartir dikin. Ji ber vê yekê, pêwîst e em meseleya tenduristiya derûnî ne tenê ji aliyê klînîkî ve di çarçoveya edalet û wekheviyê de jî binirxînin.

**Bandorên bêedaletiya civakî**

Di navbera bêedaletiya civakî û tenduristiya derûnî de têkiliyeke xurt û rasterast heye. Tê dîtin ku çiqasî bêedaletiya di nav civakê de zêde dibe, îxlalên mafên mirovan jî ewqasî zêde dibin. Ev herdu diyarde, ew dînamîk in ku hev xwedî dikin û gelek caran ji hev venaqetin. Awayên bêedaletiya civakî yên weke newekheviyên aborî, cudakerî û bêhiqûqî, bi awayekî neyînî bandorê li rewşa derûnî ya takekesan dikin û dibin sedema dijwarbûna pirsgirêkên derûnî.

Weke ku parêzer Eren Keskin di hevpeyvîna xwe de destnîşan dike, bi taybetî kurd li Tirkiye û Kurdistanê bi awayekî sîstematîk rastî îxlalên mafên mirovan tên. Binpêkirina mafê jiyanê, windakirina kesan di binçavan de, şewitandina gundan û îşkenceya zayendî, nemaze salên 90î, bûyerên gelekî dijwar bûn ku bandoreke kûr li ser derûniya civakê hiştin. Îro jî ev îxlal bi awayên cuda didomin; zext û zor li azadiya xweîfadekirin û birêxistîbûnê tê kirin û gelek siyasetmedar, rojnameger û parêzvanên mafên mirovan di girtîgehan de ne. Ev îxlalên mafan bêedaletiya civakî kûrtir dikin. Antropolog Abdurrahim Ozmen jî di çarçoveya asîmîlasyon û etnokujiyê de behsa van polîtîkayan dike û dibêje ku ev polîtîka wek "hewldana afirandina tabula rasayeke erdnîgarî û dîrokî" ne û armanc dikin ku çand û nasnameyên cuda ji holê rakin. Qedexekirina ziman û guhertina navên cihan mînakên vê etnokujiya çandî ne ku bandoreke neyînî li aîdiyet û derûniya mirovan dike. Derûnnasê civakî Ercan Şen jî balê dikişîne ser ku kurd ji ber polîtîkayên cudakarî û asîmîlasyonê yên dewletê di warê gihîştina çavkanî û derfetan de rastî newekheviyê tên û ev yek dibe sedema pevçûnan.

Edaleta civakî, bi wateya xwe ya herî giştî, têkiliyên navbera civak û takekesan saz dike û armanc dike ku çavkanî, maf û derfetên di nav civakê de bi awayekî adilane li her takekesî bên belavkirin. Dema di vê belavkirinê de newekhevî çêdibin û takekes di gihîştina mafên xwe yên bingehîn de rastî astengiyan tên, edaleta civakî pêk nayê. Weke ku tê destnîşankirin, pîşeya xizmeta civakî jî xwe dispêre mafên mirovan û pêkanîna edaleta civakî weke yek ji armancên xwe yên bingehîn dibîne. Civakên ku newekhevî û bêedaletî tê de berbelav in, ji bo xweşhaliya derûnî ya takekesan jîngehên birîsk ava dikin.

**Trawma, edalet(î) û derûnnasî**

Trawma, weke hemû cure serpêhatiyan tê pênasekirin ku yekparebûna derûnî û laşî ya takekes dihejînin, diêşînin û birîndar dikin. Bêedaletî, dibe ku bixwe trawmayek be yan jî dibe ku bandorên trawmayên heyî kûrtir bike. Pêkneanîna edaletê, qebûlnekirina êşên mexdûran derûniyê hildiweşîne. Dema rastî tê veşartin, binpêkirin nayên tomarkirin, delîl tên tunekirin, înkar serdest dibe, edalet û telafî pêk nayên û rê li ber dubarebûnê nayê girtin, hilweşîna derûnî jî kûrtir dibe. Bi taybetî di wan rewşan de ku mexdûr tê sûcdarkirin an jî darizandin ber bi mexdûr ve tê veguhastin, trawmatîzebûn dijwartir dibe.

Pisporê xizmeta civakî Bilal Yildiz jî diyar dike ku kesên rastî îşkenceyê tên, gelek caran ew kes in ku herî zêde ji edaleta civakî bêpar mane. Îşkence ne tiştekî tesadufî ye; hin kes û kom bi taybetî tên hilbijartin. Li gor raporên Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TIHV), piraniya kesên ji ber îşkenceyê serî li wan dane kurd in yan jî ji ber sedemên polîtîk hatine îşkencekirin. Ev yek nîşan dide ku bêedaletiya civakî û îşkence bi hev ve girêdayî ne û kesên muxalif yan jî ji komên etnîk ên cuda zêdetir dibin hedef.

Rewşa ku mirov ji aliyê kes an jî saziyên ku jê bawer dike ve tê sûîstîmalkirin weke "trawmaya îxanetê" tê pênasekirin. Dema dewlet yan jî saziyên wê, berpirsiyariyên xwe yên li hember welatiyan bi cih neynin, wan neparêzin yan jî bixwe bibin çavkaniya trawmayê (wekî mînak îşkence, trawmayên girseyî, polîtîkayên parêzîtiyê/bêcezatiyê) ev cure trawma çêdibe. Parêzîtî/bêcezatî ango di binpêkirina mafekî de nedîtina fail, nedarizandina wî, necezakirina wî û telafînekirina zerera mexdûr, bandora trawmatîk a bêedaletiyê xurtir dike û berpirsiyariya dewletê tîne zimên. Eren Keskin bi taybetî behsa siyaseta parêzîtiyê ya di dozên wendakirina kesan de dike û dibêje ku dewlet bi rêya demborînê rê li ber edaletê digire û Peymana li Dijî Wendakirinên bi Zorê ya Neteweyên Yekbûyî imze nake da ku vê polîtîkayê bidomîne.

Trawma tenê di asta takekesî de namînin, digihîjin astên kolektîf jî. Trawmayên kolektîf ên ku ji ber sedemên wekî trawmayên girseyî, şer, karesatên xwezayî û komkujiyan derdikevin holê dibe ku bi nifşan bidomin û birînên derûnî vebikin. Ev cure trawma, wekî "trawmayên hilbijartî" dibin beşeke girîng a nasnameya komê û ji nifşekî derbasî nifşekî din dibin. Dema trawmayên hatine jiyîn nehatibin serifandin û şîna wendayiyan nehatibe girtin, bîra trawmatîk derbasî nifşê din dibe. Derûnnasê civakî Ercan Şen jî vê yekê piştrast dike û dibêje ku tecrûbeyên cudakeriyê û binpêkirina mafên mirovan di bîra kolektîf a kurdan de şopên kûr dihêlin.

**Rola edaletê di başbûnê de**

Ji bo başbûna birînên civakî, pêkanîna edaletê xwedî girîngiyekê ye. Tê gotin ku heta civak guh nede trawmayên hilbijartî û ji bo dermankirina birînan mekanîzma neyên avakirin, dê nasname tûjtir bibin û civak ji hev dûr bikeve. Başbûn, berî her tiştî bi xwegihandina rastiyê-heqîqetê pêkan e. Navlêkirineke dirust a tiştên hatine jiyîn destpêka başbûnê ye, lê başbûna birînê bi raçavkirina heqîqetê bi awayê şênber pêkan e. Têkoşîna malbatên kesên hatine wendakirin, weke Dayîkên Şemiyê mînakeke girîng a vê lêgerîna heqîqet û edaletê ye.

Di vê nuqteyê de, têgiha edaleta başker derdikeve pêş. Edaleta başker, ji cezakirinê wêdetir diçe û armanc dike ku zerera hatiye dayîn bê telafîkirin, têkilî bên başkirin û rê li ber dubarebûna bûyerên bi vî rengî bê girtin. Tê diyarkirin ku edaleta başker prensîbên bingehîn ên weke; pêkanîna edaletê, qebûlkirin û bibîranîna êşên mexdûran, mafê zanîna heqîqetê (erkê dewletê yê tomar û arşîvkirina binpêkirinan), mafê tezmînatê û garantîkirina dubarenekirinê dihewîne. Herwiha tê gotin ku di nav mekanîzmayên edaleta başker de lêborînên fermî, muzeyên bo rûqalîbûna paşerojê, abîde û merasîmên sembolîk jî cih digirin. Abdurrahim Ozmen balê dikişîne ser girîngiya naskirina mafên çandî û zimanî û bidawîanîna polîtîkayên asîmîlasyonê ji bo pêkhatina edaleta civakî ya rastîn. Dema rêyên normatîf (siyasî) ji bo lêgerîna edaletê tên girtin, komên bindest ber bi rêyên ne-normatîf ve tên dahfdan. Ji bo başbûn û aştiyeke mayinde, divê rêyên siyasî yên vekirî û edaleteke rastîn hebe. Di dawiyê de, tê îfadekirin ku divê edalet bibe têgihek ku bingeha wê azadî, wekhevî, mirovatî, hezkirina jiyanê û jiyana birûmet û bi nêzîkahîtêdaneke civakî ji nû ve bê pênasekirin û azadkirin.



Aşkere dibe ku tenduristiya derûnî ji çarçoveya edaleta civakî nayê cudakirin. Bêedaletiyên civakî, ji newekheviyên aborî bigire heta binpêkirinên mafan û polîtîkayên bêcezatiyê, wekî çavkaniyeke bingehîn a trawmayê û xirabûna derûniyê derdikevin pêş. Ji ber vê yekê, pêvajoyên başbûnê, nemaze ji bo trawmayên kolektîf û navnifşî, ji derxistina heqîqetê û pêkanîna edaleta başker ne serbixwe ne. Avakirina civakeke ku tê de her kes xwedî rûmet, wekhevî û derfetên adilane be, ne tenê armanceke civakî ye, şertê bingehîn ê tenduristiyeke derûnî ya giştî û saxlem e jî.

***Çavkanî***

***Dildar, A. (2025). Trawmaya kolektîf, veguhastina navnifşî û edaleta başker. Psychology Kurdî, 9(20), 16-20.***

***Gündüz, G. (2025). Edaleta civakî, mafên mirovan û xizmeta civakî. Psychology Kurdî, 9(20), 31-37.***

***Kaya, B. (2025). Edalet derûniya mirov hildiweşîne an baş dike? (Wer., Abdulsıttar Özmen), Psychology Kurdî, 9(20), 10-15.***

***Keskin, E., Özmen, A., Şen, E., & Yıldız, B. (2025). Hevpeyvîn. Psychology Kurdî, 9(20), 21-30.***